



Wêne: Şaban Dayanan


Di Roja Aştiyê de (1.9.1995) li Stenbolê pîreka Albayê ku li Mêrdînê hate kuştin Tomris Özden û xwişka gerila Xebat, Emîne Duman ji bo aştiyê bi destên hev girtin. Di gel ku hemû rê maseya diyalog û aştiyê nîşanî Tirkîyeyê didin, dişa jî ew li ser şer û înkare îsrar dikin.

Kesên ku beşdarî Semînera Osloyê bûn, der heqê şerê li Kurdistanê de gihîştin yek encamê:

## Divê herdu aliyên şer bikevin riya diyalogê

- **YAŞAR KAYA:** "Beşdarên biyan li ser mafên mirovan sekinîn, lê nûnerên rêxistin û saziyên kurdan zanîn ku pîrsgirêka kurdan meseleyeke neteweyî û siyasî ye. Şerek li Kurdistanê heye, divê çareyek jê re bê dîtin. Nûnerên kurdan li ser daxwaza federasyonê hemfikir bûn."
- **PSK- BUROYA DERVE:** "Nebûna nûnerên tirkîkan kêmasiyek bû. Ji ber ku armanca semînerê diyalog bû. Her wisa jî, bi nehatinê, dewlet û partiyên tirk rûreşiya xwe eşkere kirin. Kesên biyan baş dîtin û tê gihîştin ku kurd ji bo danûstandinê amade ne, lê tirk di revin, ev jî bo kurdan gelek baş bû."
- **İSMAİL NACAR:** "Semîner jî bo çekirina bingeha diyalogê gaveke baş bû, lê tiştê girîng helwesta me kurd û tirkîkan e. Ji bo rojavayîyan tiştê girîng berjewendiyên wan e. Her çiqas ew di warê parastina hinek nîrxandin de hasas bin, ew bi qasî me gelê me nas nakin."

Rûpel 2



Berpîrsî YNDK le başûrî Kurdistan Dr. Sîrwan bo Welatê Me diwa û wîti:

## Demanewê xebatî xoman têkel be xebatî bakur bikeyin

- Le ber ewe ême be palpiştî PKK em erke pîrozeman xistote pêş xo bo encadanî ew yekêtiye. Le layekî trîşewe xebatî beşî bakurî Kurdistan geyîştote qonaxî rizgarî niştîmanî, emêş lem beşey başûr da pêwîst e le heman qonax da bête cêh.
- Ême wek YNDK wek rêxrawêkî Kurdistanî xoman nasanduwe be cemawerî Kurdistan. Le ber eweş îstratejî xoman lew rûwangeyewe dariştuwe. Eme ewe egeyênê ke ême bo yek girtnewey hemû parçekan xebatî xoman saz kirduwe.

Rûpel 8-9

Kesên ku beşdarî Semînera Osloyê bûn, der heqê şerê li Kurdistanê de gihîştin yek encamê:

# Divê her du aliyên şer bikevin riya diyalogê

**Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya:**  
**"Di semînerê de nûnerên siyasî yên saziyên kurdan, nûnerên rêxistinên Norwec û Amerîkayê hebûn. Dewleta tirk hinek rojnamevan û pisporên xwe şandibûn. Beşdarên biyan li ser mafên mirovan sekinîn, lê nûnerên rêxistin û saziyên kurdan dan zanîn ku pirsgirêka kurdan meseleyeke neteweyî û siyasî ye. Şerek li Kurdistanê heye, divê çareyek jê re bê dîtin. Nûnerên kurdan li ser daxwaza federasyonê hemfikir bûn."**

por û mafparêz, nûnerên parti û saziyên kurdan jî hebûn. Her wiha Serokê Giştî yê Partiya Karkerên Kurdistanê Abdullah Öcalan jî, mesajek şand semînerê û niyaza jî bo çareya siyasî eşkere kir. Tevî vexwendina amadekarên semînerê jî, nûnerên dewleta tirk beşdarî semînerê nebûn. Bi tenê hinek rojnameger û akademisyenên tirk tevî wê bûn.

Her wekî rayedarên dewleta tirk, çapemeniya tirk jî li dijî semînerê helwest nîşan dan. Her çiqas mijara semînerê wekî mafên mirovan hatibe diyarkirin jî, beşdarên kurdan dan zanîn ku doza kurdî meseleyeke neteweyî û siyasî ye. Kesên ku tevî semînerê bûn jî, bi piranî li ser rewşa gelê kurd û şerê li bakurê Kurdistanê rawestiyên.

Serokê Enstîtuya Mafên Mirovan Prof. Asbjörn Eide, di axaftina xwe de qanûn û rêzîkên NY, REHE, Konseya Ewropayê yê li ser mafên hindikahiyên bi bîra beşdarên xistin û da zanîn ku, li gorî qanûnên navneteweyî pêwîst e mafên gelê kurd bîn parastin. Her wisa Dadgerê Dadgeha Bilind a Norwecê Erik Mösse, bal kişand ser dozên ku li Tirkiyeyê hatine vekirin.

Di semînerê de Sekreterê Navneteweyî yê Partiya Sosyal Demokrat a Danîmarkayê û Endamê Koma Xebata li Ser Kurdan ya Înternasyonala Sosyalist Lasse Budtz, da zanîn ku armanca hemû hewldanan divê jî bo pêkanîna diyalogê di navbera aliyên şer

de be. Budtz diyar kir ku li Tirkiyeyê, zilm li hindikahiyên olî û neteweyî tê kirin û azîneyên ku dewleta tirk bi kar tîne, ne nûjen û demokratîk in.

Rayedarê Şaxê Mafên Mirovan yê Komeleya Hiqûqzanên Norwecê û Serokê Konseya Kurd li Norwecê Jon Rud axaftinek kir û bal kişand ser rewşa kurdên li Rojhilat û Başûrê Biçûk. Rud li ser rewşa başûrê Kurdistanê jî sekinî û da zanîn ku bi taybetî PDK zilmê li mirovên sivil dike. Yek ji beşdarên semînerê jî Nûnerê Helsinki Watch a Amerîkayê Christopher J. Pannico bû. Wî jî axaftinek kir û helwesta dewleta tirk li hemberî kurdan rexne kir. Panico gote ku kurdên Tirkiyeyê jî mafên ku li rojavayê Tirkiyeyê tê bikaranîn jî, bêpar in. Li gorî agahiyên ku kesên beşdarî semînerê bûne didin, rojnamevanên tirk bi piranî dîtina dewleta xwe anîne zimên û xwestine gotûbêj ji çepera birdoziya kemalist dernekevin.

Li ser semînerê me dîtine hin kes û saziyên ku beşdarî semînerê bûne pirsîn, bi piranî semîner wekî gaveke baş tê dîtin. Armanca amadekarên semînerê wekî vekirina riya diyalogê tê ravekirin. Her wiha tevî ku tiştê li ser hatiye axaftin û lihevkerin çêbûne, nebûne biryar jî, piraniya beşdarên jî bo şerê li Kurdistanê diyaloga kurd û tirkan û herdu aliyê şer pêwîst dîtine. Li vir em dixwazin hin xalên girîng ji nixandînen wan kes û

saziyan pêşkêşî we bikin.

**Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya**  
 "Di semînerê de nûnerên siyasî yên saziyên kurdan, nûnerên rêxistinên Norwec û Amerîkayê hebûn. Dewleta tirk hinek rojnamevan û pisporên xwe şandibûn. Beşdarên biyan li ser mafên mirovan sekinîn, lê nûnerên rêxistin û saziyên kurdan dan zanîn ku pirsgirêka kurdan meseleyeke neteweyî û siyasî ye. Şerek li Kurdistanê heye, divê çareyek jê re bê dîtin. Nûnerên kurdan li ser daxwaza federasyonê hemfikir bûn. Her çiqas bandora Amerîkayê li ser semînerê ne zêde be jî, çavê Amerîkayê li ser semînerê bû. Ev semîner gavek bû, ji bo pirsgirêka kurdan. Ez bawer im piştî vê semînerê wê hinek tiştên girîng biqewimin."

**Serokê Projeya Mafên Mirovan yê Kurdistanê (KHRP) Kerim Yıldız:**  
 "Tiştên ku beşdarên li serê li hev kirin, hebûn. Hate gotin ku divê hebûna kurdan bê pejirandin û bikeve nav qanûnan, ji bo vê yekê jî guherîna Qanûna Bingehîn a Tirkiyeyê hate xwestin. Her wiha pêwîstiya diyalogê di navbera herdu aliyên şer de (dewleta tirk û PKK'ê) derket holê. Dîsa di semînerê de hate xwestin ku herdu alî riayetî qeydeyên şer bikin û mercên benda 3'yemîn ya Peymana Cenevreyê pêk bînin. Bi vê semînerê gelemşeya kurdî dikeve riya çareseriyê navneteweyî."



Yaşar Kaya



Murat Bozlak



Ismail Nacar

**Serokê HADEP'ê Murat Bozlak**

"Norwec ne dijminê tirkan e, ew dixwaze têkiliyên dostane pêk bîne. Di semînerê de meseleyên wekî pêşvebirina mafên mirovan, demokratîkbûna Tirkiyeyê û gelemşeyê kurdan hatin guftûgokirin. Her çiqas tu biryar nehatibin standin jî, fikr û ramanên heja yên beşdarên derketin holê. Hinek şexsên ku ji gel û rastiya gel dûr tiştên çewt anî zimên jî, bersiva wan hate dayîn. Ji ber ku gelemşeya kurdan dibe meseleyeke navneteweyî êdî her kes pê re eleqedar dibe."

**Buroya Derve ya Partiya Sosyalist a Kurdistanê (PSK)**

Semînera Osloyê ji hin aliyên ve gihîşt armanca xwe, ji hin aliyên ve jî negihîşt. Ji bo armanca semînerê beşdarên bûna nûnerên dewleta tirk wekî kêmasiyekê bû. Ji ber ku armanca semînerê pêkanîna danûstaneke di navbera kurd û tirkan de bû... Her wisa jî, bi nehatinê, dewlet û partiyên tirk rûreşiya xwe eşkere kirin. Her çî kesên biyan baş dîtine û tê gihîştin ku kurd ji bo danûstandinê amade ne, lê tirk direvin, ev ji bo kurdan gelek baş bû."

**SAMÎ BERBANG**

## Leyla Zana bû berendama fermî ya Xelata Nobelê

Komîteya Xelata Nobelê ya Aştiyê, ji nav 35 kes û 85 rêxistinên berendam, navê 5 berendamên xelatê niqand û wekî berendamê fermî diyar kir. Li gorî rojnameya Dagbladetayê, di nav listeya dawîn de navê mebûsa kurd Leyla Zana jî heye. Nûçeya ku roja 26'ê rezberê hate weşandin, eşkere dike ku ji bilî Zanayê, navê kesên wekî Papaz Carlos Beloyê jî Timora Rojhilat ku di bin îşxala Endonezyayê de ye, Sergey Kovalyovê rûsî ku li hemberî bînpêkirina mafên mirovan li Çeçenistanê xebatê dike,

Wei Jingshengê çînî û Serokê Amerîkayê yê berê Jimmy Carter he ne.

Derdorên siyasî didin zanîn ku şansê parlementera kurd ji yê din zêdetir e, ji ber ku ew hem jin e, hem jî ew wekî nûnerê gel neheqî lê hatiye kirin, tê dîtin. Bi awayê kesên ku piştigiriyê didin Leyla Zanayê, dibêjin parlementera kurd ji bo çareserkerina doza kurdî bi riya aştiyê xebatê kiriyê û ji ber vê yekê bi 15 salî hatiye sizakirin. Li gorî agahiyên, wê di 13'ê meha kewçêrê de kesa/ê ku xelat kar kiriyê eşkere bibe. Rayedarên tirk

ditirsin ku bi xelatstandina Leyla Zanayê şermezariya wan derkeve holê û doza kurdî populer bibe, ji lew re jî, li hemberî biryara komîteyê nerazîbûna xwe diyar dikin û çapemeniya tirk dest bi kampanyaya li dijî Zanayê kir.

Li aliyê din tê gotin ku, Leyla Zanayê jî Serokwezîra Norwecê Gro Harlem Brundtland re nameyek şan-



Leyla Zana

diye û jê tika kiriyê ku ew rewşa gelê kurd û zilma li wan tê kirin bine rojva Neteweyên Yekbûyî û Konseya Ewropayê. Navenda Nûçeyan

\* Li Hev Rûniştina Dublînê Têk Çû...



## Hemleya Başûr li dijî dagirkerî û hevkarîyê ye

**Dema em van hemû bûyeran bidin ber hev tê dîtîn ku li hemberî PKK'ê hevalbendîyeke (îtifak) navneteweyî pêk hatiye. Yên ku dixwazin şer biqede divê ji PDK'ê bixwazin ku bi dewleta tirk re têkiliyên xwe qut bike û li başûrê Kurdistanê li pêşîya federasyoneke demokratîk nebe asteng. Gelo bicihanîna van daxwazan pir diwan e?**

Li Başûrê Kurdistanê ev çend sal in ku PDK û LYNK li ser hesabên dagirkerên Kurdistanê û hêzên împeryalist xwîna gelê mîna avê dirijînin. Buha û qîmeta mirovan daketiye pênçî dolarî. Di vî şerê dawîn de zora hev nebîrin û encama ku Amerîka û Tirkiye li bendê bûn, pêk nehat. Gel ji van herdu hêzan gelek aciz bûbû û li pey alternatîfêke nû bû. PKK'ê rewşa Başûr baş analîz kiribû û li vir hêdî hêdî hîmê şoreşê vedida. Amerîka û Tirkiyê bi lez û bez herdu hêzên Başûr vexwendin Dublînê û peymanekê li dijî gelê kurd bi wan dan qebûl kirin.

PDK ji bo bicihanîna xalên vî paymanê gelek bi daxwaz bû û bi lez û bez xwe amade dikir.

PKK'ê dîsa wekî her tim ev rewş û provokasyona hanê di demê de dît ji bo rizgariya neteweyî û parastina xwe neçar ma ku li Başûr lîstik û planên dijminên

gelê kurd vala derxe. Ev hemleya li Başûr destpêkirî, ne li dijî gelê me yê li Başûr û partiyên kurdan e. Ev hemle li dijî wan kes û derdorên ku li pêşîya rizgariya neteweyî bûne asteng, di xizmeta dewletên împeryalist, kolonyalist de û hevkarî û îxanet ji xwe re kirine kar û siyaseta, hatiye kirin.

Divê PDK baş were nasîn. PDK'ê her tim piştî xwe bi dagirkerên Kurdistanê û dewletên împeryalist ve girê daye, bûye aletê berjewendiyên wan û bi vî siyaseta xwe gelek zirar daye rizgariya neteweyî. Her tim berjewendiyên malbata xwe di ser berjewendiyên neteweyî re girtine û gel û netewebûna wî kirine qurbanê berjewendiyên xwe yên erzan. PDK'ê li ser daxwaz û fermana dewletên dagirker kes û hêzên welatparêz û şoreşger li parçeyên din tesfîye kirine, kuştine û cese-dên wan teslîmî dijmin kirine. PDK bi vî dîrok û pratîka xwe, li pêşîya rizgariya Kurdistanê û netewebûna gelê kurd bûye kelem û bend.

Dema em bala xwe didin Rojhilata Navîn, van çend salên dawiyê gelek guherînan mezînin pêk hatin. Bêguman ev guherîn Kurdistanê ji nêzik ve eleqedar dikin û ew dewletên ku hesab û berjewendiyên wan li ser Kurdistanê û Rojhilata Navîn hene, vala nasekinin. Em dibînin ku Amerîka, plan û senaryoyên xwe li vir dixwe jiyane. Ji aliyekî ve hêzên Başûr û Kongreya Netewî ya Iraqê (INC) vedixwîne Dublînê û karê ku

li para wan ketiye, dide ber wan. Ji milê din ve zavayên Saddam Huseyin dide revandin, leşkeran li dewletên dora Iraqê bi cih dike.

Ev hevalbendîya li dijî PKK'ê ji Amerîka, Tirkiye û PDK'ê tenê pêk nehatiye. Wekî din jî hevalbend hene. Divê mirov hinek li ser wan raweste. Doğu Perinçek di 5'ê rezberê de di radyoya Swêdê beşê tirkî de hevpeyvînekê dike û ji uslûba şerê taybetî hîn xerabîr bi uslûbekê dev diavêje PKK'ê û serokatiya wê. Li vir du xalên girîng derikevin pêş. Çima di vî demê de û çima li Swêdê? Gelo dixwazin li Swêdê mesajê bidin kê? Ev beşê tirkî bi navê "Radyoya Merhebayê" tê nasîn û li ku provokatorek an xayînek hebe tîne û li dijî rizgariya neteweyî dide peyvandin.

Uslûb û hedefa Perinçek uslûb û hedefa provokatoren berê ye, ev kontrayê çepgir wekî yên beriya xwe welê dibêje: "PKK ketiye bin kontrola mafyayê û CIA'yê, Amerîkayê vexwendiyê Tirkiyeyê ji ber vî yekê me nikaribû iktidara karkeran ava bikira, PKK bûye neteweperest, ew serhildanên di salên 1989 û 1990'an de min organîze kirin û hwd." Ev ne tesaduf e. Hemû ji navendekê tîne birêxistin kirin. Li Osloyê di meha gulanê de xwestin konferansê li ser kurdan li dar bixin û nûnerên gelê kurd û muhatabên rastîn venexwînin vî koferansê û heta çend kesên ku tu eleqeya wan bi kurd û Kurdistanê re nemaye, populer bikin, derxin pêş û bi van ke-

san re li gorî berjewendiyên xwe karê xwe biqedînin. PKK li hemberî vî helwestê bi tundî rawestiya.

Li Swêdê jî hinek kurdên ku ji xwe re dibêjin "siyasî" û "rewşenbîr" li dijî hemleya Başûr îmzeyan berhev dikin û dibêjin "Em li dijî şerê birakujîyê ne, li Başûr dewleta federe çêdibû PKK'ê nehişt, niha jî aştî dihat Başûr, PKK'ê dîsa şer derxist." Dewleta dagirker a tirk, Kurdistanê wêran dike, dişewitîne, bi milyonan gel ji gund û bajaran surgun kirine, hovîtiya nemayî kiriyê, rojekê ji rojan dengê ji van "siyasî" û "rewşenbîran" derneketiye, îmzeyek berhev nekirine, belavokek belav nekirine. Amerîka jî kurdên Başûr "baş" û "hêjayê parastinê" dibîne, yên Bakur jî "terorîst" û "hêjayê kuştinê" dibîne.

Ew kesên ku xwe kurd, Kurdistanî û welatperêz dibînin divê îxanet û hevkarîya bi dijmin re teşhîr û mehkûm bikin. Ji bo yekîtiya neteweyî û Kongreya Neteweyî hewl bidin, bixebitin û gavan bavêjin.

Dema em van hemû bûyeran bidin ber hev tê dîtîn ku li hemberî PKK'ê hevalbendîyeke (îtifak) navneteweyî pêk hatiye. Yên ku dixwazin şer biqede û bi rastî jî dilsoz in divê ji PDK'ê bixwazin ku bi dewleta tirk re têkiliyên xwe yên li dijî neteweya kurd qut bike û li başûrê Kurdistanê li pêşîya federasyoneke demokratîk nebe asteng. Gelo bicihanîna van daxwazan pir diwan e?

ROBÎN REWŞEN

### Di navbera pêşmergeyên PDK'ê de şer derket

Li navçeya Selahadinê ku biryar-geha Mesûd Berzanî lê ye, di navbera pêşmergeyan de şer derket. Pêşmergeyên di bin fermandariya Nejad Parlemant de dan zanîn ku ew naxwazin bi PKK'ê re şer bikin, li ser vî yekê pêşmergeyên di bin fermandariya Nerû de şer birin ser wan, li wir 2 pêşmerge birîndar bûn. Piştî re Nejad Parlemant ji aliyê îstixbarata PDK'ê ve hate girtin.

### Li Wanê kontrayek hate birîndarkirin

Roja 26'ê mehê li Xaçurta Wanê kontrayek bi navê Murat Demir ji aliyê hin kesên çekdar ve hate birîndarkirin. Li gorî agahiyên ku bi dest ketine birîna wî giran e. Murat Demir di girtîgehê de bû îtfakar, piştî ku di sala 1991'î de hate berdan, dest bi karê kontrayê kiribû. Demir di kewçêra 1993'yan de belavkarê Özgür Ülkeyê Adnan Işık li Wanê kuştibû.

### Li Stenbolê mewlîda bi kurdî hate xwendin

Roja 24'ê rezberê li Mizgeta Sultannahmedê ji bo giyana Ehmedê Xanî, Şêx Seîd û kesên ku di grevên birçibûnê de mirine mewlîdek hate xwendin. Nêzî sê hezar kesî beşdarî mewlîdê bûn. Piştî mewlîdê bi kurdî xutbeyek hate xwendin, tê de daxwaza aştiyê hate zimên. Hin kesên wekî Şerafettin Elçi, Hasan Mezarcı jî beşdarî vî mewlîdê bûn. Di dema xwendina mewlîdê de elektrîk hate birin.

### Demiral doz li endamên CHP'ê jî vekir

Serokdozgerê DGM'ya Enqereyê Nusret Demiral, der heqê amadekarên deklerasyona li ser kurdan a CHP'ê de, dozê vedike. Demiral da zanîn ku wê der barê Fehmi Işıklarê ku deklerasyon xwend de jî, dozê veke. Serokdozgerê DGM'ê Demiral got: "Heke deklerasyon bi raya delegeyan bihata pejirandin me yê der heqê CHP'ê de jî doz vekira."

### Baweriya dewletê bi wezîrên xwe jî nîn e

Wezîriya Karê Hundirîn a Tirkiyeyê lîsteya karsazên ku "têkiliya wan bi PKK'ê" re heye eşkere kir. Navê 193 karsazên kurd di lîsteyê de cih digire. Di nav wan kesan de navê Wezîrê Xebatê Ziya Halis jî cih digire. Ev lîste jî nîşan dide ku dewlet baweriya xwe bi tu mirovên kurd nayne û wan her tim wekî sûcdarên potansiyel dibîne.

# Qetlîama Bucayê hate lanetkirin

**D**erdorên demokratîk bi çalakî û daxuyaniyên xwe qetlîama ku hêzên dewletê roja 21'ê rezberê di Girtîgeha Bucayê de pêk anîn lanet kirin. Piştî qetlîamê jî hinek qawî li ber xwe didan. Lê bi hewldanên nûnerên sazîyên demokratîk roja 25'ê rezberê nûnerên dîlan û rayedarên Wezîriya Dadê li hev kirin û mafên însanî yên dîlan hatin qebûlkirin. Rêxistinên wekî Komîsyona Amadekirina Konfederasyona Karmendan, Yekîtiya Şaxên Menzelen Endazyar û Mîmaran yên li Enqereyê, Yekîtiya Tabîban, Yekîtiya Eczavanan, Platforma Demokrasiyê ya Enqereyê, Komeleya Hiqûqvanên Nûjen, Komeleya Çandê ya Pîr Sultan Abdal, Egit-Derê bi hev re daxuyaniyek ragihandin û êriş li ser girtiyan protesto kirin û xwestin ku dawî li bûyerên bi vî rengî bê.

rovana (IHD) roja 22'yê mehê bi daxuyaniyekê ev bûyer protesto kir. IHD vê rûdanê wekî nişana rikdariya dewletê bi nav dike. Tê gotin ku hêzên dewletê bi awayekî hovane êriş birine ser dîlan û nehiştine ku doktor dîlan tedawî bikin. IHD dixwaze Wezîriya Karê Hundirîn destê xwe ji girtîgehan

bikişînin. Her wisa jî tê xwestin ku zilm û zora li ser dîlan dawî lê bê, tedawiya girtiyan di bin çavdêriya Menzela Tabîban de çêbibe û kesên ji qetlîamê berpirs bîn darizandin. Di sa tê xwestin ku rê li ber lêkolîna komîsyoneke ji IHD, Baro û ÇHD'ê pêk hatî, vebe. HADEP'ê jî bi daxu-

yaniyekê qetlîam protesto kir. HADEP tê de wiha dibêje: "Ev dîmenên hovane didin zanîn ku hê jî rejîma 12'yê rezberê (cunta) li ser kar e."

Partiya Sosyalist a Yekbûyî (BSP) van êrişan wekî kirinên bi plankirî dinirxîne. Li gorî BSP'ê dewlet dixwaze civakê mîlîtarîze bike û bi çavsooriyê mirovan bitirsîne. BSP dixwaze ku hemû mirov li hemberî bûyerên bi vî rengî dengê xwe bilind bikin.

Partiya Guherîn û Demokrasiyê (DDP) jî bi daxuyaniyekê qetlîamê protesto dike. Tê de dide nişan ku rejîm li hemberî têkoşîna kedkaran û şerê azadiyê yê gelê kurd diheje. Li gorî DDP'ê heta şerê kirêt berdewam bike wê bûyerên bi vî rengî biqewimin, lewre jî pêwîst e dewlet bi destê aşîyê ku gelê kurd dirêj kiriye bigire.

Qetlîam li gelek deran bi çalakîyên cur bi cur tê protestokirin û li hinek girtîgehan girtiyan jî bo protestoyên dest bi grevên birçibûnê kirin.



Hêzên dewletê bi qetlîamên wiha dixwazin çavê mirovan bitirsînin.

Navenda Nûçeyan

Navê 5 kesên ku di xaçepirsa hejmara 44'an de peyva veşarî 'SALBORÎN' dîtine û kasetaya Nilüfer Akbal "Miro" qezenc kirine:

İbrahim Halil Cıvış  
Etlîk/Enqere

Ahmet Boran  
Güngören/Stenbol

İzzet Eker  
Bayrampaşa/Stenbol

Mehdi Çelik  
İzmir

Ferhat Can  
Sêrt

## XAÇEPIRSA BIXELAT (44)

X	L	C	E	K					
N	A	Z	M	H	İ	K	M	E	T
W	A	N	P	L	A	V	İ		
Ş	Ê	R	G	Ö	O	S	A	R	
N	A	R	A	N	E	N	A		
H	V	Ê	G	A	Â	M	Î	N	
T	A	V	R	E	Ş				
L	A	A	Z	E	R	İ			
H	Ê	R	İ	E	T				
B	A	Z	N	E	B	İ			

PEYVA VEŞARÎ → (S·A·L·B·O·R·İ·N)

## XAÇEPIRSA BIXELAT (46)

Hunermendkî kurd	Genim, qût	Sembola Hidrojenê	Zincîr	Sembola Oksîjenê	Rojek
Feqîr	Erd	Aşîna	Amûrek muzîkê	Giyayek	
			Bi İngiltzî çay		Rêxistîneke Îrlandayî
			Cetwelek		
Kesê di wêneyê de Agirê volkanan		5			
		Navekî mîran			Negatîv
		Notayek			
Rebarek li Afrîkayê				Beşek ji pê	3
Taybetîya xwînê				Çiya	
6	Derece				Rêxistîneke Baskî
Agir		Fek		Oral	
Alfîrîn				Rêxistîneke Amerîkî	
				Beav	7
				Kinnivîsîna Mister	
Beşek ji nava malê	2	Qerlafa piraniyê	Bawerîya olî		
Gihanekek					
	Aşiq				Tîpa dozdemîn

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi riya pişkê (kura) li 5 kesan tîn belavkirin. Xelata hejmara 44'an; kasetaya Nilüfer Akbal "Miro" ye.

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

### Xelata Xaçepirsê



Pirtûka Gabar Çiyan

"Tarihte Kürt Sürgünleri"

PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5 6 7

# Li Hindistanê sazûmana demokrasiyê rûneniştîye

**Di sala 1947'an de Hindistan xwe ji bin destê dagirkeriyê azad kir û dewleta xwe ya serbixwe ava kir. Çiqas gel dilşa bû jî, bi cudabûna Pakîstan ji Hindistanê, demeke nû ya kul û kederan dest pê kir. Heta îro bi milyonan mirov hatine kuştin û sazûmaneke demokratîk di Hindistanê de cihê xwe negirtiye.**

Dîroka Hindistanê ya cudakirinê di sala 1947'an baş hatiye nasîn: Hema piştî serxwebûna welêt veqetîna misilman û hindûyan hate ber derî. Serokê Partiya Îslamî ku bi eslê xwe ji Pakîstanê

bû, rêberên tevgera serxwebûnê Gandî û Nehrû re şertê veqetîna Pakîstan û Hindistanê danîbû. Serokên tevgerê nedixwestin tiştêkî wisa pêk were, ji ber ku veqetîna misilman û hindûyan bi xwe re gelek problemên civakî û aborî dianîn.

Heta ew pêşniyaz dikin ku di dewsa Nehrû de Serokê Partiya Îslamî Jinnah bibe serokwezîrê yekemîn, lê Jinnah vê yekê jî napejirîne. Lewma jî di sala 1947'an de li ser xaka Hindistanê du dewletên cûda pêktên; Hindistan û Pakîstan. Bi vê yekê re dîroka şer û pevçûnên di navbera netewe û olan de dest pê kir. Zêdeyî 12 miyon insan koçber bûne, zêdeyî milyonêkî hatine kuştin. Jî-nên ku bi deh hezaran

hatine revandin, bi namûsa wan hatiye leyistîn û hatine kuştin, meseleyeke kûr e û lê heta niha jî veşartî maye. Hindikahiyên vî welatî jî mafstandinê pir dîr in. Herwiha îro jî dewleta Hindistanê li hêrêma Keşmîrê mafên mirovan dide bin piyan.

Di sala 1947'an de Hindistan xwe ji bin destê dagirkeriyê azad kir û dewleta xwe ya serbixwe. Çiqas gel dilşa bû jî, bi cudabûna Pakîstan ji Hindistanê, demeke nû ya kul û kederan dest pê kir. Heta îro bi milyonan mirov hatine kuştin û sazûmaneke demokratîk di Hindistanê de cihê xwe negirtiye. Ev 49 sal in ku Nehru di zagonên Hindistanê de nivîsand ku divê her hindikahî li Hindistanê bigihîje mafên xwe. Lê dewleta

Hindistanê îro jî her demê zêdetir ketiye demeke dijwar û gelê kêmhejmar jî mafên xwe dîr in.

Her roj li Keşmîrê nêzîkî 500 hezarî heta 900 hezarî leşker û polis gel kontrol dikin. Bejarê Srinagar pêşî jî bo xweşî û spehiya xwe bi nav û deng bû. Îro bûye kamp û garnîzona leşkerî. Her 20 metreyî leşkerek û cihê kontrolê, her pêncî metre mewziyên leşkerî ku tê de xwe ji bo şer amade kirine, hene. Herwiha li Pencabê jî pêşî leşkeriyê her tişt xiste bin destê xwe û bi hezaran mirov kirin girtîgeh-an, niha jî dozên siyasî dest pê kirine. Tenê li der û dorên Keşmîrê di van demên dawîn de nêzîkî 30 hezar mirov hatine kuştin û wekî her dewletek ku ne azad be, li vê derê jî hingavtin heye. Dewleta Hindistanê wê înkâr dike û dixwaze li vê derê hilbijartinê çêbibe. Lê ev hilbijartin jî dixwaze mijarên esasî û pêwîst bincil bike.

Artêşa Hindistanê bi roj û êvaran, heza nivê şevê dikeve malan, dest diavêje jinan, zêr û hebûna wan talan dike. Li ser kolanan dikevin ser dilê mirovan û wan dikutin. Li Keşmîrê nêzîkî 5 milyon keşmîrî dijîn, lê mafê wan yê siruştî nîn e. Ev niha pênc sal in ku li vê derê şer dom dike. Dewlet car caran ceyranê, telefon, an jî avê dibire.

Komên îslamî jî mirovan wiha hêsantir dikarin organîze bikin û li dijî neheqîya dewletê



**Siyasetvanê Hindistanî M. Gandî her tim dixwest ku mesele bi riya aştîyê çareser bibin.**

mirov diçin li gel wan kar dikin. Xwepêşdanê wiha mezin çêdibin ku jiyana wê hêremê radiwestîne. Gelê Keşmîrê ketiye nav zilm û kotekîya dewleta Hindistanê û rexistinên fundamenta- list ên îslamî. Her dem di rewşên wiha de gel diêşe û qurbanan dide. Di sala 1947'an de bi damezirandina Hindistanê Nehru di zagona bingehîn benda 370'yan de, soz dabû hemû gelên bîndest ku mafên wan û otonomiyê bide wan. Lê heta niha ev tenê li ser kaxez hatiye qebûl kirin û di rastiyê de tiştêkî nîn e.

Dîroknasekî hindî di sedşala 12'an de digot: "Mirov ne bi artêşê, mirov bi evîne dikare mirovên Keşmîrê qezenc bike." Lê serokê Hindistan Rao belkî jî bîr kiriye ku wî dîroknasî çî gotiye. Heta daxwazên Gandî yê aştxwaz zû hatin

jîbîrkirin.

Ku dewleta Hindistan siyaseta xwe li Keşmîrê neguherîne, Keşmîr vê bibe wekî Afganîstanê. Neteweperestî û nijadperestî li Keşmîrê xurtir dibin. Ev pêşveçûn ne ji bo Keşmîr û ne jî bo Hindistanê tiştêkî baş e. Dewleteke mezin wek-Hindistanê pirdengîya gel, çand û olan diviya bibûya mînakeke baş ji bo hemû dewletên cihanê.

Raman û felsefeya Gandî bi teorî çiqas rast be jî, her ewqas zarokên wî îro li dijî vê ramanê kar dikin. Hindistan ketiye nav pîrgirekên pîr mezin. Heke rayedarên vî welatî naxwazin di pêşerojê de bi teqîneke pîr mezin re rû bî rû bimînin, divê di demeke kin de li gorî seretayên demokrasiyê kar bikin.

Î.K. / Brüksel



**Serokwezîre Hindistanê P. V. Narasimha Rao (li aliyê çepê). Her çiqas li ser navê demokrasiyê kar bike jî, şerê û pevçûnê rê nadin demokrasiyê.**

Parastina dewleta Tirkîyeyê her roj, ji bo dewleta Amerîkayê diwartir dibe. Di wan salên dawîn de li Senato û Kongreya Amerîkayê bi êşkere li ser rewşa Tirkîyeyê ya xedar, îhlalkirina mafên mirovan û pîrsa kurdan gotûbêjan dest pê kirine. Piştî îşgala Kurdistana Başûr rûmetdariya dewleta Tirkîyeyê pir ket. Di Kongreya Amerîkayê de bi êşkere li ser qirkirina dewleta tirk li dijî gelê kurd tê axaftin. (John Porter, 22.3.1995'an, di axaftina xwe ya Kongreyê de) Nûnerê Kongreya Amerîkayê D. Amato (komar-

## Polîtîkayên Rojavahiyan diguherin

van) dibêje ku Tirkîye ketiye destê komeke qatîl.

Her wiha rojnameyên Amerîkayê êdî çêtir li ser pîrsa kurdan radiwestin. Rojnameyêke mezin di Amerîkayê de The Los Angeles Times li ser îşxalkirina Kurdistana Başûr wiha dinivîsand: "Mekîna kujyar bi xwe re şer dike." New York Times di hejmara xwe ya 30.3.1995'an de dinivîsîne: "Tirkan rawestînin" û dixwaze ku PKK wekî RRF (FKO) û IRA'yê were pejirandin û The

Washington Post di mejûya 20.3.1995'an de dinivîsîne: "Çavekî Tirkîyeyê kor e" û dixwaze ku dewleta Amerîkayê û Tirkîye pîrsa kurdan çareser bikin, radyoyên wekî National Pacific Radio ku zêdeyî 10 milyon guhdarvanên wê hene hevpeyvînan bi kurdan re çêdikin. Bi kurtasî mirov kare bibêje ku pîrsa kurdan li ser rojevê ye.

Dewleta Tirkîyeyê nêzîkî 100 miyon dolarî her sal ji bo karê dîplomasiyê û pey-

wendiyan, li Amerîkayê bertîlê dide, da ku li ser pîrsa kurdan neyê axaftin. Lê béguman ev stratejî nameşe. Giraniya dawleta Tirkîyeyê wekî dema şerê sar nemaye. Îro dostên xwe li Ewrûpa û Amerîkayê bi mezinbûna komên îslamî yê radîkal ditirsîne. Tansu Çiller di avrêla 1995'an de li Washingtonê digot: "...ku hûn (Amerîka) piştî me negirin, komên îslamî yê fundamenta- list û radîkal wê zêde û xurtir bibin û Tirkîye êdî nikare

daxwazên we bi cih bîne... (Ilhan Kızıllan, Washington D.C 1995). Çiqas stratejiyên dewleta Amerîkayê bi zanistî jî hatibin amadekirin, rastî xwe didine xuyan ku pîrsa kurdan û gelê kurd nakevin nava ramyariya Amerîkayê. Îro gelê kurd û têkoşîna wî di Rojhilata Navîn de rastiyeke li ber çavan e: Bêçareserkirina pîrsa kurdan ne aştî û azadî û ne jî pêşveçûna civakî, ramyarî û aborî li hemû Rojhilata Navîna gengaz e. Ev rastî jî, bandora xwe li ser Ewrûpa û Amerîkayê dihêle.

**DARA AZADÎ**

# FAL



**BĒRAN (21 Adar - 20 Avrêl)**

Hinek kes ji bo ku kîsê we vala bikin, bi we re hevaltîyê dikin. Pêşiyên me gotine: "Bi dev dixwe, bi rû fedî dike." Bes ew kesên ku li derdora we diçin û tî, qet fedî jî nakin. Divê hûn wan kesan û hevalên ji dil, ji hev derînin.



**GA (21 Avrêl - 21 Gulan)**

Hûn, ji guherîne ditirsîn. Li gorî felsefeya we "Diya tirso-nekan nagirî", lê bîyî guherîne di civakê de bipêşketin çênabe. Heyberê ku xwe neperisîne, dixurife û tu tişt nikare wî/ê ji hilweşîne xelas bike.



**CĒWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)**

Di van rojan de we dest bi karekî nû kiriyê. Heke hûn li ber xwe bidin, rîya serkeftinê li ber we vekirî ye. Lê ser-sariya we li ber serkeftinê astenga herî mezin e, hinekî serê xwe li ser bûyeran biêşînin.



**KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)**

Dinya ne roj û danek e, divê mirov bi tevîr be. Bes dilte-nikiya we hin caran dike ku hûn vê qeydeyê ji bîr bikin. Bi taybetî van rojan, divê hûn bêpere nemînin, li pêşiya we rîya nexweşaneyê dixuye.



**ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)**

Dema xelk hinekî pesna we dide, hûn xwe winda dikin. Êdî çavên we tiştêkî nabînin. Bav û kalên me gotine: "Çêkîro bixwe kiro, xerakîro bi xwe kiro." Lewre divê hûn xwe zêde bernedin, da ku hûn nekevin rewşên xerab.



**SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)**

Hûn pêşî mirovan bi rexneyên hûrbîn dîn û har dikin, lê dema bar dikeve ser milê we, hûn ji alîkariyê jî narevin. Ew tişt dilê hevalên we xweş dike, lê hin kes rewşa we dişibînin gotîna, "Berf diçe, erd dimîne." Lewma ew guh nadin rexneyên we.



**MÊZÎ (24 Rezber - 23 Kewçêr)**

Di jiyana we de hevkeşeyek nîn e. Lewma hûn hin caran dibin nêçîr, hin caran jî nêçîrvan. Bi rastî jî hin caran, divê mirov xwe ji we biparêze. Hevaltîya bi we re heta derekê xweş e. Ev dişibe gotîna "Kêfa bûkê, heta sûkê."



**DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)**

Gotîna "Gelo ezo, bi destmala gul gevezo", rewşa we diyar dike. Dema hûn timtêlên xwe diguherînin, hûn jî êdî xwe nas nakin. Her çiqas piraniya hevalên we bi vê guherîne bixapin jî, hinek bi rîya ku we deşîfre bikin hesiyane.



**KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)**

Hin caran, hûn bi tevgerînen xwe, gotîna "Benîştê xwe, çûye bi netika xwe ve daniye", tînin bîra mirov. Pêşî hûn dilê mirovan dihêlin, pişt re hûn poşman dibin. Dema ew tişt dikevin ser hev, êdî mirov ji niyeta we dikevin gumanê.



**KARÎK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)**

Hûn ji kêmasiyên xelkê îstifade dikin û wan ji xwe re dikin pir, ji bo ku xwe bigihînin mebesta xwe. Hin caran ji we tê ku hûn "Bi gur re bixwin, bi xwedî re şîne bikin." Hê ku tu kes bi vê tewra we nehesityane, dev jê berdin.



**DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)**

Bi we jî xuya ye ku hewce bi guherîneke berfireh û rihvedayî heye. Lê hûn hêvî dikin ku "Av rîya xwe bibîne." Heke hûn guh nedin hevalên xwe û dev ji vê stratejiya xwe ya çewt bernedin, wê bêhn bikeve avê.



**MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)**

Hûn hin caran li hemberî heqaretan jî qet xwe tev nadin. Rast e, dilê fireh zû pîr nabe, lê gelo difirehiyê jî jê re sî-norek nîn e? Heta kengê hûnê li hemberî zilma neyaran bêdeng bimînin. Jiyana wisa heta hetayê be, çî jê tê?

# Meletiya Keşe Ezîz

Keşe Ezîz, keşeyê gundê Qilitê bû. Mirove stemkar û di mijara olî de gelek renc û tade dida gundiyan. Rojek gundî giş civînek çêdikin û biryar digirin ku sibê biçin gundê Hemêdiyê nik şêx, bibine misliman da ji zilma Keşe Ezîz rizgar bibin. Ê, di her civakê de sîxur hene. Di wê civîne de jî sîxurê Keşe Ezîz hebû, diçe jê re bûyerê rave dike. Keşe dibêje: "Giha Xwedê, giha min, ev tiştêkî hêsane."

Dotira rojê bi spêde re Keşe Ezîz li hespê xwe siwar dibe û diçe Hemêdiyê nik şêx. Ji şêx re dibêje: "Qurban, ez hatime li ber destê te ku bibim misliman."

Pir kêfa şêx bi Keşe û ji biryara wî re tê. Misînek dide dest û odeya ku tê de bihêwire, şanî dike û dibêje: "Çend rojan mêvanê min bimîne, em ji xwe re gale gal bikin. Jixwe tu her tiştî dizanî." Keşe Ezîz diçe oda xwe, nêzikî nîvro, Qilitî giş, tevî pîrek û zarên xwe tene Hemêdiyê, nik şêx dibin misliman. Dotira rojê rêdan ji şêx dixwazin ku vegerin Qilitê û ji bo hîni perestiya ola îslamî bibin, meleyekî jîr û zana dixwezî. Şêx bangî Ezîz dike dibêje: "Ji te çêtir, jîr û zanatir nîn e. Ji te re şaşik û cibe, ji îro pê ve tu meleyê Qilitê yî."

Mele Ezîz spas dike, destê şêx maç dike, lê Qilitî

şaşmayî dimînin. Sed caran li hatina xwe poşman dibin. Li vegerê Mele Ezîz ji wan re dibêje:

"Gelî Qilitîno, ger hûn misliman in, ez Mele Ezîz im û hûn mesîhî ne, ez Keşe Ezîz im. Îcar hûn zanin, we divê misliman bin û we divê jî emê giş mesîhî bin, biryara we ye."

Gundî dibêjin: "Ji bo ku em ji zilma te xelas bin bûne misliman. Ma çî îşê te bi mislimaniyê heye? Madem xelasiya me ji destê te nîn e, emê li ser ola bav û kalên xwe bimînin. Em mesîhî ne, tu jî keşeyê me yî."

Î. OMERÎ

## Her teref bûye teşt!

Kurê malê yekî eraqve-xw-ker e. Rojekê şûşeyêke eraqê ji xwe re dikire û diçe malê, li ber xwe datîne da eraqa xwe vexwe. Diya wî jî arvan moxil dikir. Gava ku kurik vedixwe, diya wî jê dipirse: "Kurê min ew çiyê tu vedixwî?" Kurik dibêje: "Dermanê serêşê ye dayê."

Dayika wî jî dibêje: "Bi Xwedê serê dayika te jî gelek diêşe, ka hinekî bide dayika xwe jî kurê min." Kurik jî daxwaza dayika xwe naşikîne û piyalayekê ji eraqa ziwa dadigire û dide dayika xwe. Dayik jî çavê xwe digire û eraqa ziwa bi ser xwe de dike. Piştî neh-deh deqîqeyan serê dayikê digere û moxila xwe tije arvan dike û li nava odê diçe û tê. Teştê wê li rexekî dimîne û ew li rexekî arvanê xwe moxil dike. Kurik dibêje ku diya wî çî

sosret bi malê de aniye. Gazî diya xwe dike û "Yadê, ma tu çî dikî, teştê te wa li dera hanê ye, te hundir tev di arvan de hişt", dibêje. Diya wî jî wiha lê vedigirîne: "Dengê xwe neke kurê min, her teref jî diya te re bûye teşt"...

## Esalet û Weselat...

Rojekê ji rojan gerîla Rdadikevin nava gundekî û diçin mala mele. Nanê xwe dixwin, çaya xwe vedixwin, wextê razanê tê, şervan vedikevin. Sibehê zû mele radibe ku biçê mizgeftê. Lê dinêre ku cemseyên leşkeran ber bi gund ve tî. Mele dikeve tayê. Dibêje "Ez çawa bikim, çilo bikim?" Heta ku here malê, wê leşker tê kevin nava gund, ger nere malê jî, wê şervan di mala wî de bêne girtin. Ji nîşkav ve li xwe

hayil dibe û destê xwe diaveje mîkrofona mizgeftê, bang dike: "Eselat û weselat, de rabe xortê welat. Weleh leşkerê TC'ê hat."

## Vin...Vin...

Rojekê yekî torî ji Êlehê bi Rtrênê diçe Amedê. Gava ku li kompartimanê rûdinê, mîşek bi dora wî dikeve û wî gelekî zivêr dike. Yê torî dike nake mîş dev jê bernade. Çima carekê keysê li mîşê nayêne û mîşê nagire.

Piştî ku mîşê digire, wê di nav mista xwe de dişidîne, devê xwe dibe ser destê xwe û ji mîşê re "Vin...vin..., vêca xwaş a hii..., de wilo xwaş a?" dibêje û pacê vedike, mîşê berdide derve û paşê "De vêca tu jî peya wera heya Amedê, ji bo tu zanibî vin vin çawa ye", dibêje.

AMADEKAR: ARGÊŞ AZAD

## Dir û ler

Li gundekî Ezexê ku li ser bajarê Şernexê ye, Lmeleyek hebû ye. Rojekê mamosteyê gund tê cem wî û ji xwe re dipeyivin Mamoste jî, yekî nijadperestê tirk e. Dema diaxivin, mijar tê ser ziman.

Mamoste dibêje: "zîmanek bi navê kurdî li dinyayê tune ye. Ev zîmanê hûn pê dipeyivin, tevliheviya tirkî, farisî û erebî ye"

Mele jî yekî jîr bûye û ji mamoste re dibêje: "Esil

tirkî tune ye. Binêre! Sosyolojî, psikolojî, ekonomî, enflasyon û hemû yê lojî pê ve ne, ji zîmanê ewrûpî hatine. Îsim, mana, mektûp, mekteb, teslîm û hwd. jî, ji erebî tî. Serserî, serxweş, çerçeve, dilovan, dîrbîn û hwd. jî, ji kurdî û farisî tî."

Mamoste dibêje: "Ev çawa dibe, tu zîmanî tirkî ji holê radikî?"

Mele dibêje: "Bi rastî wiha ye. Binihêr, li ser vê

erebeyê çî dinivîse? (wê demê erebeyek resmî li cem wan e.)

Mamoste dibêje: "Resmî Hizmete Mahsustur."

Mele lê vedigerîne: Ev nivîs hemû bi erebî ye, di nava wê nivîsê de, "tur" tenê bi tirkî ye. Zîmanê we tenê, "dir" û "ler" in. Hûn dir û ler, bi dû devorka dixin û hûn ji vî zîmanî re dibêjin ev tirkî ye."

ÇIYA MAZÎ

Gringî siyasî û mêjuy Şerefname bo xebatî istay gelî kurd (2)

# Şerexanî Bedlîsî kê ye?

Lew serdeme da ke şerêkî berde-wam le nêwan herdu dewletî Sefewî û Osmanî hebu, mîrnişîne kurdekan ke xakekeyan le newan em du zil-hêze da bun tuşî agrî em şer u pêkdadane bun. Kurdekan hiç berjewendiyân lem cenge da nebur hezişyan nedekird tekela-wî bin belam siyasetî herddu la buwarî bê layenî nehêştabuwe. Êdî her weku Şerexan boman degêrêtewe debuwaye le nêwan neman u hîway deselat we dest girtnewe helwêstêk helbjêren.



Şerexanî Bedlîsî  
Wêne-y Aşubî

Mîr Şerexanî Bedlîsî le gundî Grîhradî nîzîk şarî Qum le salî 25.2.1543 le dayîk buwe bawukî nêwî Şemsuldîn Xan buwe, le salanî 1509-1576, le Bedlîs le layen Osmaniyekane-der kirawen naçar buwe rubikate lay Sefewiyekan ke ew deme penagaw tar-dugey ew kurdan e bu ke le dest Osmaniyekan hele-haten.

Lew serdeme da ke şerêkî berde-wam le nêwan herdu dewletî Sefewî û Osmanî hebu, mîrnişîne kurdekan ke xakekeyan le newan em du zil-hêze da bun tuşî agrî em şer u pêkdadane bun. Kurdekan hiç berjewendiyân lem cenge da nebur hezişyan nedekird tekela-wî bin belam siyasetî herddu la buwarî bê layenî nehêştabuwe. Êdî her weku Şerexan boman degêrêtewe debuwaye le nêwan neman u hîway deselat we dest girtnewe helwêstêk helbjêren.

Mîr Şemsedin Xan le layen Tehmasbî Yekemewe Şay Sefewiyewe pêşwazî lê ekrê û pley xanî pê debexşê her le ber hoyekî siyasî Mîr Şemsedin heldestê be hênanî kîjêkî Sefewî ke kîjî Emîrxanî Muslo ke yekêkbuwe ke mezinekanî sefewîu le heman kat da Azerî û şîeesbuwe. Amançî Mîr Şemsedin lem jin hanîne. Ewe buwe hal û mercêkî baş bo xoy birexşênêl e jîyanî penaberî piştû piştîwan peyda kat û bitawanê mîrnişînekey le destî Osmaniyekan rizgar bikat. Her weha Sefewiyekaniş le heman kat da wîstuyane le rêgey jin û jin xwastin binemaley kurdekan be xoyanewe girê biden mîrnişînekeyan bixene jê destî qelemrewî dewletî Sefewî.

Lêred Şerexanî Bedlîsî ke weku kurî mîrî gewre (Umeray Uzam) Le layen Şay Sefewî (Tehmasbî Yekemewe) temaşa krawe boye le der barey

şahêtiyewe le gel mirzade û şahzadekan hellsu kewtî kirduwe, le temenî nuh (9) salî da le gel ewan perwerde kirawe. Le gel ew mindalane bewan nedrawin têkelî komel bibin.

Lêre da be wardî fêrî zanistî ayinî û hunerî swarçakî û tîrendazî û çewgan û yasay bekarhênanî çek û hunerî wêne kirdin.... Hitir bo mawey sê sal mawetewe carê. Hozekey rojêk be rêkkewtin le gel Şah Tehmasb, Şerexanyan le temenî 12 salî be piley mîr helbjêrdiran hew rojewe çendîn erkî berêuberayeti û sipayî pê raspêrîra Şerexan heman rêgay bawkî girtiwe û kiçî xalî hêna, ke Xalî (Mukemedbeg) hakimî Hemedan buwe. Salî 1576 katêk Şah İsmailî duwem le Gezwîn deselat degêrte dest. Şerexan piley mirîmiranî pê dedrê le leyan şah we debête berpirsyarî iş u kanî kurdan weku le serewe bas kirawe.

Paş mirdinî Şah Tehmasb, le nêwan çek-girekan da şer u pîlan gêran û yektir golkirdev peredêsênê le nêwan destelatdarani fermanre-wa. Şerexan buwe hoy cêgey Êreyî û narezayî be hoy ew serkewtinane ke be destî hêna bu. salaranî tawanî şah le destelat xistîyan xiste palî û bo ewey le nawî berin, le encam da bo mawey salêk û seh mang kira be hakimî Nixçuwan. Le salî 1578, le gel nîzîkey 400 kes ger-ayewe bo Bedlîs û mîreyetî nawçekey pê drayewe. Şerexan le temenî 53 salî da wazî le deselat hênan xoy bo nusînî şahkarekey amade kird. Rojî salî mirdinî diyar niye, belam yekek le nasekan salî mirdinî, salî 1603-1604'î danawe.

Kokirdinewe û Nusînî  
**FADIL AHMED**  
Wergêr bo latînî kurdî  
**DİLÊR**

Yên berî me çî,  
çawa dinivisandin?

Ji dîroka

rojnamegeriya kurdî

Nivîsek ji hejmara 7. a  
Kovara Ronahî  
Mêjû: 1942, 1'ê kewçêrê

## Dojeha Stalîngradê

Tu kesî dogeh ne dîtiye, heke dîti be jî kes jê venegeriyaye û ji me re ne gotiye ew kana agir çilon e. Lê dibêjin ko ew çaleke kûr e, agir tê de agirî dikelîne û di ser wê re pirek heye, xelk di wê pirê re derbas dibin û yê gunehkar wextê jê diborin, pir diqelêşe û gunehkarên reben dikevin nav wî agirê ko agirî jî dişewitîne.

Li gora vî wesfî Stalîngrad îro dojeha vê dinê ye. Ev bûye qedere mehekê ko eleman gihaştine kûçe û kolanên bajêr û şerê ûrisan di xanî û avahiyên bajêr de dikin.

Carina danezanên rûsî û elemanî dibêjin: me du xanî bi şûn de vegevandine, an me ji nû ve du xanî zemt kirine.

Ma ev iş çawan çêdibit û ûris rexma ko dijmin ketiye hûndirê bajêr û di hin avahiyên de jî bi cih bûye çawan terka bajêr nadin? Ji ber ko ûris mîrên qenc in û dilê wan bi evîniya welêt û miliyetê hiltavêje û şerê xwe jî bi awayê ko emê niho bibêjin dikin.

Elemanan piştî ko xanîkî kiçik xisti bû destên xwe, jê berda bû ser avahîke mezin; avahîke sê tebeq. Eleman bi êrîşa xwe a pêşîn keti bûn tebeqa avahiyê a pêşîn. ûris jî wê tebeqê kişiyân, an tê de hatine kuştin; bêî ko tebeqên din jî dest bidin. Avahiyê zêrmînek jî hebû. Birekî eskerê ûris xwe tê de veşarti bû. Eskerên zêrmîne jî jêr de berda bû tebeqa pêşîn û şerê elemanan dikir. Herçî ûrisên ko di tebeqa didiwan de bûn wan jî bi werîsan xwe dahelande tebeqa pêşîn û li pencereyên wê tebeqê sekinîn û piştî ko çendekê wan hatine kuştin pencereyek ket destên ûrisan. ûrisên mayî tev de û pey hev bi werîsan dadiketî wê pencereyê, tê re derbas dibûn û radihiştin elemanan. Qederê saetekê ûris û elemanan di odê û liwanên avahiyê de bi kêr û şejderman li hev dan. Eleman şikestin heye ko tev de di wî xanî de mirin û avahî ji nû ve û bi temamî ket destên ûrisan.

Ev e şerê mîran; şerê mîrên qenc.

**CELADET BEDIRXAN**

Berpîrsî YNDK le başurî Kurdistan  
Dr. Sîrwan bo Welatê Me diwa û wîtî:

# Demane wê xebatî xoman têkel be xebatî bakur bikeyin

**Le ber ewe ême be palpiştî PKK em erke pîrozeman xistote pêş xo bo encadanî ew yekêtiye. Le layekî trîşewe xebatî beşî bakurî Kurdistan geyîştote qonaxî rizgarî niştimanî, emêş lem beşey başur da pêwîst e le heman qonax da bête cêh.**

**Ême wek YNDK wek rêxrawêkî Kurdistanî xoman nasanduwe be cemawerî Kurdistan. Le ber eweş îstratejî xoman lew rûwangeyewe dariştuwe. Eme ewe egeyênêt ke ême bo yek girtnewey hemû parçekan xebatî xoman saz kirduwe. Le ber eweşê ême be piley yekem peywendiman le gel PKK kird û le heman kat da îstratejî her du laman yekê û xoman be tewawkerî PKK dezanîn le başurî Kurdistan.**


**D**etwanin be kurtî boman run bikenewe çon YNDK hate saz kirdin?

– Pêşekî zor spasî êwe û Rojnamey Welatê Me dekem bo amadekirdinî em çawpêkewtine.

Ême ewey rastî bê wek YNDK xoman saz kird. Katê ke bînînam betalayiyêkî siyasî mezin le başurî Kurdistan be dî ekrê û her weha le encamî ew hêrişaney ke dujminî dagirker bo ser nawçeke û le heman kat da gîr û gîrîftî siyasî û aborî û komelayetiyane ke em ro le Başur da be dî dekrê her çenda hoy karîgerî trîş heye. Eweş ew hizb û rêxrawaney nawçeken wek PDKû

YNK ke neyan twanîwe ew bare guncawe biqozinewe û deselatêkî ramyarî, dimokrasî Kurdistanî bihênine dî.

Le heman kata amanc û wetekanî gelî Kurdiyan pişt gewê xist û le pênavî gîrfan pir kirdinî, Serokanî xoyan penayan birde ber hawpeymanêtî. Le gel rijeme dagirkerkan wek rijemî faşist tirkî. Le ber em nahem wariyey ke basman kird ême wek YNDK ke pêk hatûyin le komele xelkanêkî bê leyenî şaroşgêr hatîne xo saz kirdin be palpiştî Partî Krêkaranî Kurdistan bo pir kirdinewey ew kelêne ke be dî ekra. Her weha ew xelkane y ke lem yekêtiye da xo debînin, ew kesanen ke bawerî



Berpîrsî YNDK le başurî Kurdistan Dr. Sîrwan

gîştîyan heye be serbexoyî Kurdistan, le heman kat da ew xelkanen ke bawerîyan waye ke Kurdistan yek xake û ciyawazî niye le nêwan her çuwar beşeke y. Her weha bawerî em yekêtiye eweye, ke le duwarjêkî nîzik da, hemû rêxraw û arte şorişgêrekan

Kurdistan, le çuwar cêwey fidrasyonêkî fire hizbî Kurdistanî ko bikene we.

**Çon geyîştine ew encame ke em yekêtiye dirust biken û be pênavî çî da bû em yekêtiye?**

– Be rastî pêman waye ke le Kurdistanî Başur da gelêk hêlî

ramyarî û rêkrawî şorişgêrî heye, her le îslamiyewe ta kome nîst. Belam lem qonaxe da ke qonaxî rizgarî neteweyî ye ême be pêwîstman zanî ke rêxrawêkî neteweyî Kurdistanî lem beşey Kurdistan da bihênînine dî. Le heman kat da wek palpiştêk le gel PKK, le beşî bakurî Kurdistan, le katêk da ke em ro bareke le bare bo pêkhênanî rêxrawêkî Kurdistanî lem qonaxe da. Le ber ewe ême be palpiştî PKK em erke pîrozeman xiste pêş xo bo encamdanî ew yekêtiye. Le layekî trîşewe xebatî beşî bakurî Kurdistan geyîştote qonaxî rizgarî niştimanî, emêş lem beşey başur da pêwîste le heman qonax da bête cêh.

Lewey ke em ro le goranî cihanîş le heman qonax da. Emêş wek ew gelane pêwîst e berew heman amanc biroyn. Sûd lew gorankariyane wergirîn ke em ro ke le welatanî Rojhelatî



Xwepêşdanek le başurî Kurdistan beharî 1995 / Sulêmanî





Emro le başûrî Kurdistan gelî ême le naw jîyaneweyêke çetîn da deji.

Nawerast hatote kayewe, her weha ew bar û doxey wek û witman ke le Kurdistan da be dî ekrêt.

**Aye tuwanîwtane heta îsta binkeyekî pitewî cemawerî le başûrî Kurdistan binyat binên le rîzekanî xotan da?**

– Ême wek YNDKwa bo mawey mange xoman aşkra kirduwe wek rêkxrawêk. Le gel eweş da le ruy çalaki û culanewey rêkxistinî hengawêkî mez-inman bo pêşewe nawe le ruy rêkxistinî cemaweriyewe. Belam eme ewe nageyênê ke ême payeyekî cemawerî be hêzman heye le naw rîzekanî cemawer le ber eweş pêwîstîman be katî fire heye ta ku bitwanîn xoman le naw dilî cemawer da cêy

xoman bikeynewe. Le gel eweş da zor karman kirduwe bo nizîk kirdînewey cemawer le rîzekanî xoman da. Le diwa rojêkî nizîk da be hîway eweyîn ke radey giştî cemawerî şorişgêr le rîzekanî xoman bibîn.

**Çi pêşbîniyêktan heye bo beşekanî tirî Kurdistan?**

– Ême wek YNDK wek rêkxrawêkî Kurdistanî xoman nasandûwe be cemawerî Kurdistan. Le ber eweş îstratejî xoman lew rûwangeyewe dariştuwe. Eme ewe egeyênê ke ême bo yek girtnewey hemû parçekan xebatî xoman saz kirduwe. Le ber eweşê ême be piley yekem peywendiman le gel PKK kird û we le heman kat da îstratejî her du laman yeke û xoman

be tewawkerî PKK ezanîn le başûrî Kurdistan.

**Etwanin rûnî kenewe ke ew peywendiyey nêwan êwe û PKK le çî ruyêkewe ye, aya tenha peywendî siyasiye yan serbazîşî le gel da ye?**

– Ziyatir ême le ruwangey neteweyî we erwanîne PKK, be taybetî û hemu part û rêkxrawekanî tirî Kurdistanî. Eme wek leweu pêş witman ke, bawerî eme be yekêti neteweyî û serbexoyî Kurdistan heye, diyare eweş rûne ke PKK raberî ew bizutneweyê ke em ro le gişt beşekanî Kurdistan da heye. Kewate ême le ruy îstrateciyetewe xoman be beşêk le PKK ezanîn lew ruwewe yek bernameman heye bo cemawerî Kurdistan.

**Êwe wek YNDK kestan heye le rîzekanî leşkra azadiya gelî Kurdistan?**

– Belê ewe bineretî xebatî ême ye. Helbete hiç xebatîkî şorişgêrî be bêxebatî çekdarî nagate encam, ême be pêy tiwana, tiwanîwmane lem ruwewe hengawî mezin binêy. Belam carê ew hîwaye niye ke ême be temayîn. Belam le dahatûyekî nizîk da çawerwanî eweyin emeş şan be şanî leşkirî azadiye gelî Kurdistan hawxebat bîn.

**Wekû YNDK pêşbînîtan çî ye bo dahatû le başûrî Kurdistan?**

– Le layen pêşbînîman bo diwaroj le Kurdistanî Başûr ewe ye ke, xebatî xoman têkel bikeyîn le gel xebatî gelî bakurî

Kurdistan û xebatî PKK bo rizgarî û azadî û serbexoyî Kurdistan. Em roş le başûrî Kurdistan hukûmetî fêdralî hatote kayewe her çende ke êsta bê hêze, belam eme ewe pişgirî dekeyin û be karêkî başî dezanîn, we emeş beşdarî em hukûmete ekeyîn bo binyatnanî hukûmetêkî dimokratî tire hîzbî bo awedan û bujandûweyey Kurdistanî Başûr her weha palpiştêk bêt bo xebatî rizgarî û serbexoyî Kurdistan. Her weha lew birwayeyin ke le helbijardinî dahatû da le Perlemanî Kurdistan be jimareyekî zor endamanî eme bikewine nêw Perlemanî Kurdistan.

AMADEKAR  
DILÊR AS-SAD  
Le bargay YNDK  
Başurî Kurdistan-  
Hewlêr

**Be rastî pëman waye ke le Kurdistani başûr da gelêk hêlî ramyarî û rêkxirawî şorişgêrî heye, her le îslamiyewe ta komenist. Belam lem qonaxe da ke qonaxî rizgarî neteweyî ye ême be pêwîstman zanî ke rêkxrawêkî neteweyî Kurdistani lem beşey Kurdistan da bihenînine dî. Le heman kat da wek palpiştêk le gel PKK le beşî bakurî Kurdistan, le katêk da ke em ro bareke le bare bo pêkhênani rêkxrawêkî Kurdistani lem qonaxe da.**

# Tirkiye bi çekên Amerîkayê kurdan dikuje

Rojnameya Saint Louis Post, roja 7'ê rezberê li ser çekên ku Amerîka difiroşe Tirkiyeyê nivîseke şiroveyî weşand. Nivîs li ser navê Jennifer Washburn derketiye, em vê nivîsê li kurdî werdigerînin û pêşkêşî we dikin.

Roja 20'ê firmehê protestovanên kurd li Capitol Hill'ê dest bi greveke birçibûnê kirin, ev çalakî piştî 13 rojên germ ên havînê qediya. Armanca çalakdaran ev bû ku balê bikişînin ser tîkiliya di navbera Amerîka û Tirkiyeyê de. Zêdetirî deh salan e ku Tirkiye bi çekên Amerîkayê êrişî ser gundên kurdan dike û wan vala dike. Ji beşdarên livbaziya Dara Azadî armanca livbaziya wiha anî zimên: "Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) bi hikûmeta tirk re di peywendiyên pir nêzik de ye. Ambûrên leşkerî yên DYA'yê ji aliyê dewleta tirk ve ji bo xerakirina gundan tê bikaranîn. Ev ne tiştêkî nû ye. DYA vê yekê baş dizane, lê dîsa jî çekan dide vê dewletê."

## Dewleta tirk êrişî ser gundiyan kurd dike

Di meha pûşperê de Wezîriya Dewletê raporek pêşkêşî Kongreyê kir, ew cara yekemîn diyar dike ku Tirkiye bi rêkûpêkî çekên Amerîkayê di operasyonan de bi kar tîne. Tê zanîn ku di van operasyonan de mafên mirovan tê binpêkirin. Li Başûrê Rojhilatê Tirkiyeyê

yê balafirên şer yên F-16 û firokeyên kobra, super cobra, skorsky û black hawk, gelek tank, zerîpoş û topan bi kar tînin ji bo ku êrişî ser gundiyan kurd bikin. Li gorî baweriya Tirkiyeyê ev gundî piştgiriya hêza dijber a sereke, Partiya Karkarên Kurdistanê (PKK) dikin.

Wek encama van êrişan hikûmeta tirk 2000 gund vala kirin û zêdetirî 2 milyon insan ji cih û ware wan kirin. Ev gundiyan bêguneh heke nebin parêzkarên dewletê û li dijî mirovên xwe şer nekin, wekî "terorîstên PKK'yî" tînin binavkirin û dibin hedefa êrişên dewletê, heke alîkariyê bi dewletê re bikin, dibin hedefa potensiyelî ya partiya karkeran.

Mixabin rêveberiya Clinton guh neda agahiyan ku di rapora wezîriya dewleta wî cih digirin û hişt ku ev şer li bakurê Iraqê jî belav bibe. Di berbanga 5'ê firmehê de 3 hezar leşkerên tirk bakurê Iraqê dagir kirin, bi mebesta pêkanîna operasyonê li ser bargê he n PKK'ê. Rêveberî (Amerîka) ji rexneyan reviya û bi tenê xwest ku operasyon ji

**Li Başûrê Rojhilatê Tirkiyeyê balafirên şer yên F-16 û firokeyên kobra, super cobra, skorsky û black hawk, gelek tank, zerîpoş û topan bi kar tînin ji bo ku êrişî ser gundiyan kurd bikin. Li gorî baweriya Tirkiyeyê ev gundî piştgiriya hêza dijber a sereke Partiya Karkarên Kurdistanê (PKK) dikin.**

Ji bo Tirkiyeyê destûra Amerîkayê pir pêwîst bû. Heke Amerîka û he-



Dewleta tirk bi supercobrayên Amerîkayê operasyona li dijî gundiyan kurd pêk tînin.

aliyê dem û berfirehiyê ve bisinor be û mirovên sivil bînin parastin. Di 20'ê adarê de dema Serokwezîr Tansu Çillerê dagirkirineke 6 hefteyan ji bo tunekirina PKK'ê

pêk anî, rêveberiyê amerîkî destgiriya wê kir. Li gorî Berdevkê Qesra Spî Michael McCurry, Serok Bill Clinton berî îşxalê bi Tansu Çillerê re peyivîye û gotiye ku Amerîka bereberiya hişk ya ku Tirkiye bi PKK'ê re dike, fêm dike û piştgiriya wê dike.

Ji bo Tirkiyeyê destûra Amerîkayê pir pêwîst bû. Heke Amerîka û he-

valbendên din karê çavdêriyê yê li Neteweyên Yekbûyî herêmê dikin, ji bo demê nedane rawestandî, hêzên tirk nikaribûn tîkewin bakurê Iraqê. Lewre NY'ê piştî Şerê Kendavê ji bo ku kurdan ji êrişên Sedam biparêze, qedexeyê hêzên hewayî ku di ser herêmê re derbas bibin. Amerîkaya ku mîsyona NY'ê pir xerab bi kar anî, ji bo avakirina 'herêma ewledar' li ser navê parastina kurdan, rê da 35 hezar leşkerên biyan ku tîkewin herêmê.

Ji sala 1984'an ku operasyonên dewleta tirk li hemberî Partiya Karkarên Kurdistanê dest pê kirine bi vir ve, DYA bi çekên ku dide Tirkiyeyê alîkariya gurbûna şer dike. Amerîkayê jî vê salê heta niha bi buhayê 6.3 milyar dolarî çek firotina vê dewleta ku di bin destê leşkeran de ye û li hemberî gelê kurd êrişên terorîstî ya bêînsaf dimeşîne. Di navbera salên 1987 û 1991'ê de Tirkiyeyê jî sedî 76'ê çekên ku ji derve distîne, ji DYA'yê standine. Di navbera salên 1991 û 1993'yan de şerê tunekirina serhildanan berfirehtir bûye, pê re rêjeya binpêkirina mafên mirovan jî zêde bûye. Her wiha di eynî demê de rêjaya çekên ku Tirkiyeyê ji Amerîkayê distîne jî bûye ji %80.

Lobiya endusriya parêziyê îdia dike ku bi firotina çekan li Amerîkayê jî mirovan re kar tê peydekirin, lê gelek çekên ku diçin Tirkiyeyê jî kîsê mirovên ku bacê didin dertên, ji ber ku Amerîka li gorî gelek peyman û projeyan wan bêpere dide Tirkiyeyê.

Ev zêdetirî deh salan e ku Amerîka bi buhayê 6 milyar dolarî çek wekî alîkarî dide hinek muşteriyên xwe. Wekî rayedarê Institutaya Polîtîkayê William Hartung jî dibêje, her lêkolîna dadyar a ku bandora firotina çekan li ser aboriyê hildide dest, divê bi vê rastiyê dest pê bike; ji sisiyan yekê çekên ku diçin derve ji baca amerîkiyan diçin.

## Divê Amerîka jî çekan nede Tirkiyeyê

Her çiqas di warê şandina çekên ji bo Tirkiyeyê de zêde astengî derneketibin jî, di pûşpera çûyî de pêşniyaza firotina bombeyên 493 CBU-87'yê di nava şaxê rêveber debû sedema gengeşiyên. Ev bombeya ku Alliant Techsystems Inc. çêkiriye, dikare 202 bombeyan li êrdimeke bi firehiya stadyumêkê bireşîne ku her yek ji wan dibe 300 parçeyî. Di rêşemiyê de li cihê ku ji ber mafê mirovan Tirkiyeyê bê pirsîyarkirin, wê bombeyên werankar bi dest xistin.

Sala çûyî Kongreyê dayîna ji sedî 10'yê 364.5 milyon dolarê alîkariya leşkerî bi şertê pêkanîna mafê mirovan ve girê da. Ev biryar li ser raporeke ku qala binpêkirina mafên mirovan û rista çekên Amerîkayê dike, hate girtin. Lê Tirkiyeyê ev şert qebûl nekir û ev pere red kir. Baweriya Tirkiyeyê bi tîkiliyan wê leşkerî yên ku bi DYA'ê re dimeşîne heye, lewma reaksiyon bi vî rengî nîşan dide. Niha amadebûna Kongreyê ku di sala 1996'an de 320 milyon dolarî alîkariyê bidê Tir-

kiyeyê, dide zanîn ku ev tîkiliyê tîra xwe xurt e.

Li aliyê din, Almanya jî di nav de birek welatên Ewropayê hemû alîkariyên leşkerî ku didan Tirkiyeyê rawestandî. Tirkiye dixwaze bi Ewropayê re Yekitiya Gumrikê ava bike, ew jî bi tesdîqkirina hikûmetên Ewropayê ve girêdayî ye. Li vir biryara Almanayê jî pir girîng e. Niha dem ji bo Amerîkayê jî musaît e ku beşdarî biryara Almanayê bibe û hemû alîkariya leşkerî ku dide Tirkiyeyê bibire.

Ev tişt wê derfetê bide raya navneteweyî ku zorê li hikûmeta Çillerê bike, da ew ku dev ji şerê li hemberî kurdan berde û li çareyan siyasî bigere. Li gorî lêpîrsîneke rojnameya Milliyetê %65 tirkan çareseriya siyasî dixwazin. Kurdên Tirkiyeyê demêkê dirêj ji hemû mafên bingeşînan ên polîtîk, azadiya derbirinê, heta mafê bikaranîna zimanê zikmakî bêpar mane. Heta Tirkiye dev ji zordestiya li ser hindîkahiyên, kuştinên bêdarizandin, îşkence û binpêkirina mafê derbirinê bernede, dawî li vê pevçûnê nayê.


Demêkê dirêj Amerîkayê her wekî rayedarekî jî van rojên dawîn got, diyar kir ku çekên diçin Tirkiyeyê jî bo parastina peywendiyê stratejîk, bi hêzeke sereke ya herêmê re ye. Di demêkê ku pevçûna etnîk li Tirkiyeyê gur dibe û aştiya cihanê tehdît dike de, çekên ku ji Tirkiyeyê re diçin, mesajêke çewt didin hemû welatên ku lê ev reng pevçûn heye.

WERGER:  
SAMÎ BERBANG



Di serhildanan de gelek zarok di bin paletên panzêran de can dane.

# MERHEBA İSTANBUL



Sultan Ahmet Platz

Pêlekê  
Pêleke ji mija xewnan rêsayî  
Ez avêtime vê peravê .. bêwîcîdan  
Odîsyos im  
Dilê min, yê ji kulmek ariya sor bû  
di gemiyê de ma  
Di riya min de bûn heft derya  
hivdeh peravên derewîn weke  
rewrewka havînê  
heftê sînoren xençerî  
heftsed şikeftên bêderî.. heftêhezar  
perî  
lal bûm ji tîrsa pêlan  
lê birînan daye min zîman  
li ber her peravî min piyalek mey  
vexwar  
her qurtek... şivek ji agir bû  
li hespê zimên diket  
De bibihîze  
Zîman wê bide cirîdê  
Merheba İSTANBUL  
ji nalînên min xuya ye ez birîndar  
im  
ji birînen min xuya ye ez kurd im  
xerîb.. bêçare.. aware dimeşim  
weke xunavê xemgînî ji rûyê min  
diniqute  
Kî ye van xeman bide hev?  
Kî ye di xirecira kolanên te de  
nalîna min bibihîze?  
Merhaba İSTANBUL  
Di binê tûrikê min de  
birînen Medî wek birûyan kom bûne  
morîkên ji gerdênên bûkên kuştî  
Çavşînkên zarokan  
Bastêqê Mêrdînê weke roj-  
nameyên pêçayî  
nalîna rezên tîrî weke helbestekê tê  
de nivîsiye  
tûtîna Mûşê.. bîna barûdê jê difûre  
Berûyên Sîpanê ku bi hêsirên Xecê  
hatin şuştin  
laleyên deşta Sirûcê

guldestek ji mija sibehên Agirî  
Di binê tûrikê min de  
Firat digirî  
Merheba İSTANBUL  
Dergêhen te hesin in  
ma dil jî?  
Dîwarên te kevir in  
ma dil jî?  
De bibihîze destana şewatê:  
ji guliyên bûkên me  
werîsan çêdikin..  
biharan bi dar da dikin  
çip...çip.. çip.  
xwîn diniqute  
roj birîndar diçe ava  
Merheba İSTANBUL  
dengê min nalîna binefşa ye  
Sed hezar darên gwîzê di çavên  
min de şewitîne  
û di gewriya min de çolan ji striyên  
kulindorê  
helbesta min birîn dike  
li welatê min  
Sed hezar tenûr vemirîne  
esman bêriya şalûlan kiriye  
Çiya çavên xwe li buhareke wînda  
digerînin  
Dayik dergûşên vala dihejînin...  
hespê Atêlla li wir dide cirîdê..  
Dîlana agir e İSTANBUL  
sosin dişewitin  
guldestên Nêrgizan di destên evîn-  
daran de dibin arî  
Merheba İSTANBUL  
Kor e yê ku birîna min nebîne  
lal e yê ku birîna min bibîne û nebê-  
je aaax  
ker e yê ku axîna min nebihîze  
hov e yê ku li ber nalînên min  
dîlana xwe ya dîn bike.

\*\*\*\*\*

Ma qedera çiyayê min e, gundên

hilweşiyayî  
weke hebanên qetiyayî  
li ser milên xwe hilgire?  
ma qedera welatê min e  
nalînên wî li ber sînoran bilikumin?  
xewnên wî di zengara qeydan de  
birizin?  
û hêviyên wî  
weke çivîkan  
di xefkên vedayî de werin kuştin....?

\*\*\*\*\*

Weke çawa ez meyê rodikim piyala  
xwe  
weke çawa ez gurzek gul ji yara  
xwe re dihûnim  
weke çawa ez di nivê şeveke  
bêdeng de  
helbesteke evînî dirêsim  
ezê hêviyên xwe jî di hemêza  
pêşerojê de bilorînim  
ezê nalînên xwe weke dîkên sibehê  
berdim  
bila bang li roja razayî bikin  
ezê ji tayên xewnên xwe  
berbangeke SPÎ bihûnim  
weke şîrê xezalan  
pelên qewanan  
ezê bi ser newalan de rokim  
da ku evîndar di nav ronahiya  
helbestên min de  
avjeniyê bikin.  
esman mişt bikim ji çivîkên devli  
ken  
tenûran tev de vêxînim  
bilûran tev de ji bin çengê xwe  
derxînim  
xençeran veşêrim  
û destê xwe  
weke dîwaneke helbestan vekim  
bibêjim  
Merhaba İSTANBUL

JAN DOST

## AWIR

### Hekîmê Loqman û şagirtê wî

Rojekê Hekîmê  
Loqman û şagirtê wî  
rûniştine sohbetê dikin.  
Wê gavê nexweşek û  
lêzimên wî dikevin  
hundir. Zikê nexweş  
hatiye ber devê wî, dike  
biteqe.

Xwediyê kesê  
nexweş dibêje: "Mîrê  
min hêviya me Xwedê û  
tu yî. Min kir û nekîr,  
nexweşiya vî camêrî  
sax nebû."

Hekîmê Loqman der  
heqê nexweş de pîrsî-  
nan dike. Piştî re radihi-  
jê şiva xwe, li zikê  
nexweş dixê. Her ku  
şivê lê dixê, pesna wî  
dide. Dibêje: "Tu  
mirovêkî wîlo baş î. Tu  
egîd î, tu mêrxas î. Tu jî  
malbateke hêja yî, ta  
pêşiyên te mîrek in" û  
hwd. Çiqas Loqmanê  
Hekîm pesna wî dide û  
şivê li zikê werimî dixê,  
zik piç dibe. Her ku  
Hekîm dibîne werma wî  
dadikeve, ew hê bêhtir  
pesna wî dide û şivê li  
zikê wî dixê çend  
deqçiqeyan ev kar wîlo  
didome. Camêrê  
nexweş sipîsax dibe,  
çavên xwe vedike.  
Bêhna wî tê ber. Tu tiştî  
wî namîne.

Lêzimê mêrikê  
nexweş û şagirtê Hekîm  
bi awayekî metelmayî lê  
fericîne.

Nexweş û xwedî,  
spas û duayên xwe ji  
Hekîm re pêşkêş dikin û  
riya mala xwe digirin.

Rojek ji rojan Hekîm  
ne li mal e, şagirt bi  
tenê ye. Dinêre ku va  
ye dîsa nexweşekî zik-  
bendek û hurmet û  
camêrek ber bi mala wî  
tên. Şagirt xêrhatîne  
dide wan. Rûdinên,  
rewşa xwe ji şagirt re  
dibêjin. Şagirt dibêje:  
"Wele Hekîm ne li mal  
e, heta sibê jî nayê. Lê  
ez jî ji vê nexweşiyê fêhm  
dikim." Welhasil, şagirt  
mêrikê nexweş li ser  
zikê piştê dirêj dike.  
Radihêje şiva Hekîm û  
dikeve ser qeltaxê  
mêrik. Dikeve ber pesna  
wî. Dibêje: "Tu egîd î, tu  
çeleng î, tu leheng î."  
Her çiqas pesna mêrik  
tê dayîn hê bêhtir diwer-  
ime. Şagirt dibêje qey  
hindik pesna wî daye.  
Dibêje: "Ma li dinyayê  
kesekî wekî te heye?!"  
çare nake.

Hengî Hekime  
Loqman digihe şagirt,  
dinere ku merikê

neqweş li ber teqînê ye.  
Heke çend carên din  
pesna wî were dayîn,  
wê zik biteqe. Hema,  
radihêje şiva xwe, bi  
hêrs li zikê wî dixê û di  
ber re jî dibêje: "Hey ker  
kurê kerê, qey niha tu jî  
dibêjî ez zilam im. Kes  
nizane tu kî yî, tu ji mala  
kê yî. Tu çawa derdikevî  
nav mirovan." Her çiqas  
dijmînen xerab têne  
kirin zikê wî piç dibe.  
Dawî nexweş tê ser  
xwe. Çavên xwe vedike.  
Dide pey xwediyê xwe,  
diçin mal.

Şagirt qerem şikandî,  
li Hekîm dinêre. Newêre  
sedema ferqiya di  
navbera van her du  
nexweşên zikwerimî de  
ji Hekîm bipirse. Hê wî  
nepirsî hekîm dibêje: -  
Lawo, ew nexweşê  
yekemîn, kurê camêran  
bû. Xwedî rûmet û xîret  
bû. Bi fihêt bû. Çiqas  
min pesna wî da, wî  
şerm dikir. Ji bo wê zikê  
wî piç bû. Lê ewê îro,  
şîrheram û kurtilekî  
beredayî bû. Te pesna  
wî dida serê wî hê bêhtir  
mezin dibû. Ji camêriyê  
fêhm nedikir. Ji wî re jî  
dijmîn pêwîst bûn.

Vêca Komara Tirkiyê  
ji nexweşê duyemîn e.  
Her çiqas pêşengê gelê  
kurd dibêje: "Em bira  
ne. Me aşî divê. Em  
tevlî hev bûne. Bi sala  
ye ku em bi hev re  
dijîn." Hê bêhtir serê wî  
mezin dibe û êrîşên hov  
dibe ser mal û milkê me  
tar û mar dike.

Jixwe di dîrokê de ji  
serdestên tirkên re qet  
rexne nehatine. Bi  
çavêkî zanyarî li xwe  
nenêrine. Tim û tim  
pesna xwe dane. Wan  
tim gotine: "Felan gel,  
an jî serokê felan  
komarê pesna tirkên  
daye." Tûristek tê  
Tirkiyeyê, rojnameyên  
wan di çih de dinivîsin:  
"George dibêje, tirkî  
çiqas xweş e, mirovên  
tirk çiqas xwîngerm û  
mêvanperwer in" û hwd.

Em bibêjin, nebêjin, ji  
darê zorê û hewldaneke  
xurt pê ve çare û mefer  
ji me re nîn e. Divê em  
kurd vê yekê baş di serê  
xwe de bi çih bikin;  
Zordarên li hemberî me,  
ji zîmanê xweş, ji  
dostanî û biratiyê fêhm  
nakin. Heke em xurt bin,  
biratî û wekheviya me jî  
wê çêbibe.

HESEN ZINAR

## ÇÎROK

## Gula Omeriyan, Têlo

Navî wî ev bû,  
hem ziravik bû  
hem jî tim li  
kêleka têlên sînora bû,  
nobedarê pez û reşiyê  
û bombe û hejarî û êşan bû.

Têlo li ser girekî bilind li Binxetê rûniştibû. Berê xwe bi aliyê Bakur ve kiribû, dengê wî tev li kîna dilê wî dibû û diherikî:

- Rojekê ezê..

Li bin çiyakê Omeriyan rûnim û ezê bigrîm û hey bigrîm, li ser tola xwe diramiya. Zarotiya windabûyî. Keriyê pezê ku ji xwe re birin. Wê çaxê biçûk bû. Dema bavê wî mir û ew hişt şivanekî biçûk li ber keriyekî bêserî li hawirdora sînorekî bêserî. Bi rewşa xwe razî dibû gava ku pêxember bi bîra xwe tanî ew jî di zarotiya xwe de şivan bû. Têlo dest bi xwendinê kir. Tim di xurcika kerê wî de pirtûk hebûn û tim jî li hêviya "CIBRÎL" ekî bû ku nameyekê ji xwedayê mezin jê re bîne. Lê carinan êşeke giran bi nava wî digirt ku gotina pêxember di hate bîra wî "ez pêxemberê herî dawî me." Têlo pirtûk bi dû pirtûkê dixwend lê..

Ne CIBRÎL hat, ne jî ew hat bîra Xwedayê mezin ku nameyekê jê re bi rêke, wekî xewnekê tê bîra wî, qaçaxçiyên keriyên pez derbasî Serxetê dikirin bi alîkariya leşkerên sînora piştî ku dev û bêrikên wan da digirtin. Têlo jî dibû delîl ji qaçaxçiyên re ji ber ku temenê xwe tev de li dora sînora bihurandibû, bombe ji bin axê derdixist wekî tu kerengekî derxî. Hêdika pê dilîst û dîv re dixist kîsê xwe û dianî malê. Wê şevê xwe li ser sînora jî bîr kir û keriyê wî birçî mabû. Bang li mîha xwe ya "şîgêr" kir, mîhê herdu lingên xwe yên pêşî di sînga wî de çandin û gepa nan ya dawîn xwar. Di wê kêlikê de leşkeran êriş kirin. Hema şivanê biçûk her du destê xwe kirin mîna zirnê û qêrîna wî li nav pêz û esmanan belav bû. Bû xirecir û ew û pezê xwe bi hev re reviyên bi alî "Amûde" de. Pez jî gava ku birçî be û li bostanekê rast be tev de dikeve xêzin, rast wek şîşa tivingê û bi diwarî jî hevdu belav dibê. Xwediyê bostan ber bi Têloyê reviyayî de hat û bang kir.

-Çi heye lawo çî heye?

-Apo leşker hatin me, leşker.

Dengê kalo li esmanekî reş û tazî dilîst:

-Wey min di çîçikên diya wan .....

Ev bênamûs dev ji kûçikaniya xwe naqerin lawo. Kulmoza leşkeran li wan derbûn. Têlo û kûçik û ker û pezê wî tev de dan ber xwe û vegeandin bi alî Bakur de. Têlo li koma çirayên hûr û pêketî yên Mêrdînê dinerî û di nava xwe de diqîçiqî. Termê kalo li dû xwe hiştin, li ser sînora heft heşt mîh li erdê gêr kirin,



kuştin, xwîna mîhên Têlo tev li axê dibû. Ax û dilê wî bihev re difûriyan, digiriyan.

Rojekê ezê..

Li ser vê axê rûnim û ezê bi kulma wê bi ser serê xwe de bidêrim. Ezê girîkî bikim ku tu carî mirov wîlo negiriyan, ezê erd û esman bi hêsrên xwe bişom.

Têloyê biçûk dilerizî di nav lepên wan de, yekî ji wan got:

- Emê wî bikujin.

Ê din lê vegeand:

- Emê wî sax bibin qereqolê, wê kêfa wan bêhtir bê.

Têlo wekî çelika çûkekî peritî û sar zimanê wî direhlî û bê hest û deng û hiş mabû.

Li qereqolê ken dest pê kir.

Mezinê wan jê re got eger tu karibe pez tevî bidî dîv xwe bi dengê, emê pezê te bi te din. Leşkeran pezê wî tev li pezên din kirin dor hezar mîh û beran tevlihev bûn:

-Divê sêsed mîhên te bi dengê te ve bîn.

Xwîn bi laşê Têlo ve hat. Bawer kir. Kurtanê kera xwe

şidand û li ber serê pez sekinî. Destên xwe dan ber devê xwe û Nisêbîn û Qamişlo û Mêrdîn û Amûde tev de bi dengê wî re li hev ketin. Sêsed mîh bi hev re bask bi wan ve şinhatin û firiyan ber bi Têlo de. Çavên wî tijî hêsr bûn. Sor bû wekî kulilka nîsanê. Leşker jî tev de mîna mîxan di cihên xwe di bédeng man kêlikêkê. Lê Têlo bi tiq tiqa kenê mezinê wan re bi xwe şiyar bû û nas kir ku tu dil di ber van cilên kesk de tune ne. Yekî ji wan bi çeplê wî girt û berê wî bi Binxetê ve kir:

-Gêt..seg oxlî seg..

Têlo jî sola xwe li şûna xwe hişt û xwas beziya pêxela Binxetê. Xwest ku bombayek wî jî hev perçewerçe bike û vene gere. Dixwest her pariyek ji laşê wî bifire hêlekê. Lê daxwaza wî bi cih nehat, berê xwe bi jor vekir û kelagiri qirik di-sot:

-Xwedêyo... rojekê ezê..

Hilkişim cem te û ezê serê te bixwîna xwe bişom. Ezê

herdû lingên te di nav hêsrên xwe yî germ de bihêlim heta ku piçka qirêjê bi wan ve nemîne, belkî wê çaxê tu bi me bihesî.

Piştî demekê poşman bû li ser van ramanên "gawirî". Vegeriya mal. Dilovanî ji Xwedê xwest û her pênc xwediyên pez ber bi Serxetê ve hilkişiyên ji bo vegeandina pez.

Ji wê rojê de Têlo mezin bû.

Gir û kîn jî pê re mezin dibû.

Kirasê melûliyê çirand û sîng tazî li dora sînora bêbext bombe hildikirin û tirs diçand, helbest ji xwe re diristin. Li wan çolan distira heta ku radiwestiya dîv re karê xwe berdewam dikir û li jor dinerî. Li çiyayên Omeriyan roj bi roj tiştên mezin nas kirin.

Tiştin neyên gotin, lê tîn dîtin.

Tu nabê ev sînora dewletan çêkirine, dewlet jî artêş û çek û qireqol in. Têlo jî nişkê ve xwe dît ku ji çaralî ve laşê wî bi dewletan pêçayî ye û li her

alî jî bombe çandine bombên ku xelas nabin. Her bombek radikir deh dihatin çandin. Rojekê li qelêvîska rûnişt serê xwe danî ser herdu çokên xwe û dest bi girîn kir:

-Rojekê ezê..

Heriya zivistana vî welatê bêxwedî teve, di rûwê diya xwe bidim. Di havîneke germ de ezê keziyên wê bi ser serê xwe de kur bikim

Werisê kîn û hêrsa wî dirêj bû heta gihîşt diya wî ya reben. Ya ku nema dizane bê çawa di vê çola bêxwedî re derketin û çawa ew aniye ser rûwê erdekê vala û bombekirî. Erê...yabo.

Ma te tu cih nedît ku tu lê bi cih bibîte ji pêvî vî sînora bombekirî û vê erda bênamûs!..

Nema zanîbû bê berê xwe bide kê, Xwedê yan dê, yan jî bavê ku serê xwe danî ji bo ku serê wî tîxe nav teqreqê. Nav û dengê Têlo belav bû. Tivîngên Amerîkî difroşe, bombe û dînamêt, cil, çek, tûtin, hesin, çaya hişk, heta bi solan jî difroşe. Têlo filitîbû ser sînora. Tim li dora xeta tirênê bû. Leşker tazî dikirin, dest ji xwendinê û şîretên diya xwe berda. Şeva wî rojê roja wî jî şev bû. Dema roj diçû ava şad dibû, rûgeş dibû, dibû mirovekî din, dengê wî zelaltir dibû. Bavê wî mir û çîrokên Omeriyan bi xwe re birin gorê, lê çend stranên xweş jê re hiştin. Her şev li bin tava heyvê û ronîya stêrkan li wan çiyên dinêrî, bi du çavên jî agir û seriyekî dagirtî:

-Rojekê ezê..

Li kêleka çiyakê Omeriyan rûnim û ezê kevîrê herî mezin bi ser serê xwe de berdim, bera perçek ji vî serî sax nemîne. Erê yadê rojekê ezê xwe û te, herduwan bikujim.

Xelk jî bi Têlo daketibûn:

-Têlo li tiştêkî buha û mezin digere.

-Ew û EZRAÏL destebirak in.

-Girekî jî zêr heye, Têlo lê digere.

-Ku bêhna Têlo diçe leşkerên sînora, leşker di cih de jî desthilanin dikevin, dilên wan diêşe.

Têlo bû dewekî ji agir di şevên reş de diçirîsî.

Xelk û leşker bi hev re jê ditirsiyan.

Tim bi rextan pêçayî bû, hewşa xwe kiribû gora tivîngên Amerîkî, geh bi bertîlan, geh bi zirtan leşkerên Binxetê ji mala xwe dîr dixistin. Lê vê gavê bû qal û behsa ronîkirina sînora. Xwestin li seranserê sînora lempan deynin ji ber ku xirecir zêde bûye. Nema qaçaxçî tenê diçin û tîn bi sed n xort û keçên şervan jî çêbûn. Bêhna şoreşekê belav dibû. Ji Têlo re li hev hat, digot:

-Rojê ceng hebe ew roj daweta min e, roja bêceng li hember van kûçikan derbas be

# Civîna komîsyona çand û hunerê ya PKDW'ê çêbû

Xebatên Parlemanto-ya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt PKDW, li gel siyasî di warên çandî de ji dimeşin. Yek ji van xebatan ji civîna komîsyona çand û huner a di roja 20.9.1995' an de bû.

Di civînê de Serokê Komîsyonê M.Emin Penciwîni, Berdevkê Serokê Komîsyonê Şemdîn, Rodî Demirkapî û Ali Mator hazir bûn. Civîn, li ser kar û barê derbasbûyî yê mehekê hate çêkirin.

Karên ku ji aliyê ko-

mîsyonê ve hatine kirin ev in:

Konferansa Dîroka Kurdistan a Navneteweyî li Lozanê hate çêkirin.

Hefta filmên Sînemaya Kurdî li Berlînê hate çêkirin.

Civîna Komîteya Karê Huner û Rewşenbîrî çêbû.

Li ser Kongreya Nete-weyî û Rewşa Başûrê Welêt civînek li Berlînê bi rewşenbîran re hate çêkirin.

Di MED-TV'ê de hevpeyvîn hatiye çêkirin.

Ji bo haziriya Festîva-

la Kurdistanê bi navê Ehmedê Xanî, xebat hatiye kirin.

Komên folklorê û orkestira bi riya MED-TV'yê bernameyên xwe ji gel re pêşkêş kiriye.

Komîsyon, li ser xebata pêş ji rawestiya û bernameya xwe ya pêş çêkir. Li gorî vê hin kar û bar hatin plankirin.

Kar û barên ku di komîsyonê de hatine pîlan kirin ev in:

Ji bo Konferansa bi navê Ehmedê Xanî ya Çand û Hunerî hazirî tê-

ne kirin. Konferans di rojên 23, 24, 25 Serma-weza 1995 an de li Berlînê çêdibe.

Haziriya Mihrîcana Govend û Muzîka Kurdistanê ya 1995'an tene kirin.

Haziriya Konferansa Hünermendên Kurdistanê hatiye çêkirin. Di civînê de hate diyarkirin ku bi riya MED-TV, Roj-nameya Welatê Me û Özgür Politikayê bang li hunermend û rewşenbîrên kurd bê kirin.

Pêşniyaz û daxwaz:

Ji aliyê Komîsyona Çand û Hunerê, ve wekî saziyên çandî ji aliyê Konseya Birêvebirinê û endamên komîsyona çandî ve bêne ziyaretkirin. Bernameyên di MED TV'ê de li ser alewîyan hîn xurtir bibe. Bernameyên ku di MED TV'ê de tene weşandin, ji aliyê hünêrî û siyasî de girîng e ji bo gel bibîne mesaj.

Servîsa Çandê

## Panela zaravayê kurmancî

Di 7'ê meha kewçêrê de li Swêdê panelek li ser bikaranîna zaravayê kurmancî tê çêkirin. Panel ji aliyê Komeleya Kurd a Demokratîk û Kulturî li Stockholmê tê organîzekirin. Di panelê de gelek bersivekî û nûnerên kovar û hin nivîskar wê li ser rastnivîs û pirs-girêkên li ber yekbûyîna zimanê kurdî bipeyivin. Kes û saziyên ku

wê beşdarî civînê bibin, ev in: Nivîskar Reşo Zilan, Ahmed Huseynî, Dr. Celadet Çeliker û nûnerên saziyên Roja Nû, Armanc, Berbang, Çira, Dugir, Welatê Me û TV'ya Med'ê. Panel li kista Trâff û di nav saetên 13.00-19.00 de wê çêbibin.

Servîsa Çandê

ew roj ne ji temenê min e. Dest bi kişandina stûnên hesinî bû. Her ji ser gavî stûnek diçandin û lempak datanîn ser. Her ku wan di rojê de stûnên xwe yhi hesinî diçandin, Têlo bi şev ew stûn li bazara Amûdê û Qamişlo erzan difrotin. Şirîkêkî hesinîfiroş ji xwe re dît û karê xwe fireh kir. Bi erebê û hesp dest pê kir, lê xwediyên ereban newêribûn pê re berdewan bikirana piştî kuştina yekî ji wan. Tevde sond dixwarin ku nivîşt di bin çenkê Têlo de hene.

Nivîştin xwedayî, ajovanekî te-  
rektorê got:

-Min bi herdu çavên xwe dît ku leşkerekî jarjûrek sax di laşê Têlo de vala kir û Têlo nemir.

Carekê şirîkê wî pê re çû nêçîra leşker û hesinên wan, piştî gotinên Têlo:

-Bi xwe çûna berxetê ji min re wekî çûna vê hewşê ye, ji ber ku ez sînor ji hewşa xwe bêhtir nas dikim.

(..ez wê şevê ji bir nakim. Ez û Têlo me nêzikayî li sînor dikir. Têlo sînga xwe tazî kir, tu nivîşt ne di stûyê wî de ne ji di bin cilên wî de tune bûn. Xwe bi rextan pêça, rahişt tivinga xwe û min da dût em gihîştin piştî xetê.

Li wir ji pûş digihîşt kabokê hema gule û bi ser me de dibariyan. Toz û dûman û îcac tevlihev bûn. Leşker bi turbêlên xwe li me digeriyan. Carekê tekerê turmpêlan wan li piştî min ket, min kir bigota teslîm lê min negot, eger ku gavekê din turbêl vegeriya wê ez bikuştama. Lê qey xwedê temen dabû min dengê

ken û qerebalixa wan hat. Min go qey Têlo kiştin ji loma dikenin. Ez yek carî ji hev ketim. Lê mîrata mirinê tahl e. Min xwe bi qulpan û zikkîşkê ji sînor derbas kir. Berê sibehe ez gihîştim malê, nivsax nîvmirî. Çend pirsan ez didam ber peşkên xwe, gelo Têlo kuştin yan na? Eger vê carê filitîbe gelo wê dîsa nêzikî sînor bibe. Ê min bi xwe ez nema nêzikayê li sînor dikim. Lê bersivên pirsên min zûka hatin ber min, dema ku piştî nîvro Têlo ez ji xew rakirim û got:

-Tu îşev ji nayê ser sînor.?)

Wê şevê dîsa tîrêjên agir zikê reşiyê diçirandin.

Xelkê tevde dizanibû ku Têlo û leşker li ber hev sekinine û şerekî giran li dar ketiye. Tevde ji dizanibû wê serê sibehe bazarên Amûdê û Qamişlo mişt hesin bin bê ku tu kes çavê wî li Têlo keve. Têlo hesinîfiroş pir kirin û ew hat veşartin. Du hikûmet bi hev re lê digeriyan. Tirsê li hawîrdora sînor kon vegirtibû.

-Ev têt û bombe ne bes in, wê hîn kehrebên (elektrîk) ji bînin.

Leşkeran her ji du sed gavî qereqolek biçûk li jora stûnên hesin ava kiribûn û bi şev di pencerên wan re nobedar ya sînor dikirin. Bi rojî dadiketin koncalan. Koncalin fireh kola bûn û xwe dixistin piştî axa wan û komkirî. Têlo biryara xwe li ber xelkê dabû:

-Roja ku we lempê veketî rêz-kirî dîtin, li ser sînor zanibin ku Têlo miriye.

Lê wê kî bawer bike ku ew roj wê bê. Her ku teqereqa tivingan bilind dibû, wênayê Têlo dihat

ber çavên xelkê û ji hev re digotin:  
-Vî mêrî EZRAÏL ji xwe re sond daye lawo.

-Bera kes nebê ez mêr im ji pê-vî TÊLO.

Têlo rûnişt û li cihekî dût dinê-rî. Li jor dinêrî:

-Rojekê ezê...

Hilkişim ser serê çiyayekî bilind, li vî welatê ku hir tişt lê mezin e, ji pêvî mirov. Koletî mezin e, mirin mezin e, bînamûsî, xiyanet, tirs mezin e, mirov tenê biçûk e. Ezê her im jora wî çiyayê bilind û ezê ji Xwedê re bêjim ma qey tê me heta.. heta ji bir bikî..?! O ezê xwe ser serî bavêjim ser vê axa bê-hest. Ezê wekî qantirêkî serjêkirî xwe di xwîna xwe de bigevizînim, heta hiş û dilê min pûç bibe. Di wê kêlikê de leşkeran ji hev re digotin:

-Ev ne karê mirovekî û duduyan e, ev karê girûbên van "terorîst" an e.

Têlo bêhna hezarê leşkeran li ser sînor dikir. Zanibû ku leşkeran hêzeke bêserî amade kirine û stûnên xwe yî hesinî bi xwe re hilgirtine. Rê tev de li ber çavên wî hatin girtin, wê şevê her du çavên xwe girtin û xwe li sînor xist. Piştî çend rojan nema dengê qurçinan xelk ji xew şiyar kirin, nema tîrê-jên sar zikê şevê diqelaştin, hesin li bazaran kêmbû û buha dibû.

Lempên veketî ji her şev li seranserê sînor rêzkirî bûn.

Tenê çiyayên Omerîyan xwe daqûl kiribûn û hêsrê xwe paqij dikirin.

Li hêviya tişteki bûn.  
EBDULHELÎM YÛSIV

## REWEZ

### Le salrojî qelmêkî şehîd da

Kerîq û buxzi dîjmi-knan dengate çele pope, ew deme nahezan be mebestî encamdanî hez û wistîyanewe, ter û wişik be hev ra desûtênin. Ew demesbalay çek û balay qelem, çinarî bala berz in û bo neyaran nayene ser çok. Ca ew dem, nahezan hemû şitêk, hemû şitêkî xirap, le songey destemo kirdinî mamize serçilekan deken.

Katêk dîjmin, penay we ber ewe bird ke, roşinbîr û zanyarî neteweyek bikujê, êdî mebest û niyaz aşkîra û zelal debin, ke pilanî qirkirdinî ew netewe ye, xirawete nexşey rojevewe.

Diwênê, le başûrî azar û birînim da, xwênî qelemekani, Ebdulxaliq Meiruf û Şakîr Fettah....û ...be ser balay mandum da, hate xwarê, û em roş le bakurî zewit kirawim da, le naw cergey şarî Diyarbekir da, qelemeky Musa Anter, goşawgoş ser debrin û paşaniş deyken be kolewîjî naw tendûrî riq û qînyan..

Musa Anterî şehîd, yaxud Apê Mûsa, rojname-nûs, zimanzan, şanonûs û zanyarî gelekeman bû. Salî 1920 le gundî Zivingî ser be şarî Nisêbîn le dayik bûwe. Derçûy Fakûltî Huqûqî Estenbûl bû. Salehay salî le zîndanî kemalistekani turk da, guzeranduwe, belam hergîz piştî xebatî lê nekirdotewe.

Le diway teykirdinî hemû ew bizane rêyaney xebat û têkoşan, Apê Mûsa rûya dekirde lawanî gelekey û deygut: Kurîne, ême tiwanîman kerwanî xebat bigeyenîne qon-axî sifir, de eweş, merd û rend bin û bigeyenine mezilî mebest. Bextî-em gele û rûy dîjminan man hemîşe ewende reş bûwe, ke, hem emyan mirovî karamey lê wînda bibê û hem ewyanîş, be şehîdkirdinî em dengane ruy xoy reştir bikat.

Musa Anter, heyfêkî gewre û giran bû, herçende darî xozge zir û bêber e, belam xozge Apê Mûsa, zortir dejya û zortirî xizmet be gelekey dekirde, ew piyawî xizmet û xebat bû, lew songeye da, çê

bibû. Înskopedyaya û katelogî netewekey bû, xoy be xizmetkarî ziman û kulturî xelkekey dezanî.

Şer û têkoşanî neteweyî le Bakur da, ber çawî turkanî weha tarîk kirduwe, ke nek mirovî kurd, belkû dar û berdî ew niştîmanêş be neyar bijmêrin û nexşey le nawbirdinî bo birêjin. Her boye Musa Anterîş, debête qurbanîyekî ew nexşe qirêje.

Nuserî gewrey kurd Yaşar Kemal, ke le 28 salî temenyewe, de gel Apê Mûsa ra, hawrê bûwe, le bîrewerî ew hawrê şehîdey da, wa denûsê: "Be birway min (rengê bawerîyekî xirapîş bê), mirovêk çendê zordar û eşkencekariş bêt, natwanê mirovî wekû Musa Anter bikujê û destî naçête ew xwêne."

Apê Mûsa, gel wayan pê dewit, zorîne ntewekey xoy xoş dewîst, belam riqî le hiç neteweyekî tir nebû.

Le berdewamî nûsîne be pêzekey da, Yaşar Kemal delêt: "Werin bo xatirî hiç na, bo xatirî ew xwêney le Musa Anter rîja, em şere biwestênin, ba çîdî xelik neçin be gîjî yek tir da û xwênî be naheq neyen rijandin."

Emê kurtepeyamî Yaşar Kemalî hewrêy ew qeleme şehîde bû. Belam, aya!? Faşîstekani turk giwêyan lê girt, yan giwêy lê degrin!? Bêguman nexêr.

Musa Anter, katêk ke, deybinî ew hemû lawe be ber çawyewe şehîd debin û sermayey roh û can, deden be welat, be giwêy dewru-ber da, deycîrand: "Gelo debê şehîdbûn be nisîbî minîş bêt!"

Rojî 20.09.1992, le şarî Amed (Diyarbekir), le ser destîmafya û çetekanî dewletî turk, em mirove aştxwaz û çakexwaze şehîd kiran û termekêşî be sutawî firê dira.

Apê Musa, diwênê le Diyarbekir şehîd kira, lê belê em ro le Hewlêr, peykerî şerefmendaney bo çê dekrêt.

Selaw û rehmetî lê bê, Musa Anter, toş rêb-warî ew karwaney ke, namirin û le dilî mîlet da, dejîn.

SÎRWAN REHÎM

# ZAROKÊN BOYAXVAN

**F**irat û Ferdanî, du zarokên boyaxvan in. Ew, li Amedê, di Komeleya Mamosteyan de vî karê xwe dikin. Rojê hindiktir çar, pênc saetên xwe li vê derê dibihurînin. Firat dozdeh, Ferdanî jî, sêzdeh salî ye. Ew li dibistana navîn dixwînin.

Rojekê me bi hev re, sohbet kir. Min jî vê, ji bo we zarokan bi awayekî hevpeyvînê amade kir, wan çawa gotin, min jî wisa nivîsî û pêşkêşî we dikim.

**We berê hevudin nas dikin?**

**Firat:** Erê em kurê xaltiya hev in.

**Hûn diravê ku ji boyaxkirinê qezenc dikin, pê çi dikin?**

**Ferdanî:** Rojê em çiqas pere kar bikin, em li hev û din parî dikin. Ez yê xwe ji xwe re xerc dikim. Ji xwe bavê min jî mielim (mamos-te) e.

**Firat:** Ez yê xwe didime

bavê xwe. Çunkî durûma aîla (malbata) me ne baş e. Bavê min jî emeletî dike.

**Hûn ji xeynî boyaxkirinê, çi tiştî li vê derê dikin?**

**Ferdanî:** Em tişteki nakin, lê em pir tişt hîn bûn.

**Tiştên çawa?**

**Ferdanî:** Min li vê derê azadî û xelkê xwe nas kirin.

**Firat:** Ez jî lîstika setrencê hîn bûm.

**Hûn vê lîstikê xweş hîn bûne?**

**Ferdanî:** Wî nizamim lê, yekcaran ku ez û ew dilîzin, ew (mamoste) nahêlin em bi zanebûna xwe bilîzin, qarişê me dibin.

**Li vê derê tiştê ku bi we ne xweş e, heye?**

**Firat:** Erê, yê min heye.

**Çi ye?**

-Ez her tim li malê û bi Ferdanî re bi kurdî xeber di-

dim. Lê li vê derê mielim zêdetir bi min re bi tirkî xeber didin. Ev jî li xweşa min nare.

**Ferdanî:** Jixwe bi hev re jî her tim bi tirkî xeber didin.

**Karekî heye ku hûn di pêşiyê de bidine ber xwe?**

(Li hemberî vê pîrsa min, her du bi hev re "dixtor" gotin. Min jî pîrsa "çima" ji wan kir. Wan pîrsa min wiha bersivandin.)

**Ferdanî:** Ji bo ku wexta yê serê çiya birîndar bibin, ez wan rehet bikim.

**Firat:** Ji bo ku pere qezenc bikim. Çunkî em feqîr in. Wexta em nexweş dikevin, bavê min nikare ji me re îlac bistîne. Ez naxwazim însan feqîr bibin...

Piştî vê axaftinê, ez bi wan re bi setrencê lîstim. Ew bi du mêjiyan, ez bi mêjiyekî bûm. Bi rastî zora min birin.

DILAWER



# D Î T Î N Û R A M A N

**Mirin çi ye?**

**M**irin wekî dawiya jiyane tê tarîfkirin. Gelo ev çiqas rast e? Çi qas ne rast e? Yanî mirin bi rastî dawiya jiyane ye?

Gelê Kurdistanê ev 12 sal in bersiva van pîrsan baş dane me. Berî 15'ê Gelawêja 1984'an dema ku li Kurdistanê mirovek dimire li pey tenê malbata wî/wê û nasê wî/wê hebûn û ev mirov piştî mirina xwe bi çend mehyan dihate jibîrkirin. Lewre van merovan ji bo gelê xwe, axa xwe û ji bo welatê xwe tişteki nekirbûn. Li vir, yek dikare bibêje "mirin dawiya jiyane" bû.

Lê piştî raperîna 15'ê Gelawêjê li Kurdistanê dema ku kesên şoreşger ji bo welatê xwe têkoşînan, ev rewş guherî. Êdî gelê kurd dema ku şoreşgerên wan tînin kuştin (ş-

hîdkirin), bi hezaran, bi milyonan li wan xwedî derdikeve. Li dû wan nagirî; dilîlînin. Dema ku ew şehîd dibin, gelê kurd şîne nagire. Dilan û şahiyê çêdike.

Şehîdê kurd, bi mirina xwe tovê jiyane diçînin, her tim fedakar in ji bo gelê xwe. Ji jiyane hez dikin. Lê ji bo jiyaneke azad û xweş canê xwe didin. Ma Kemal Pîr jî wiha ne digot:

- Em ji jiyane hez dikin. Em karin ji bo wê canê xwe jî bidin.

Belê tê xuyan ku êdî li Kurdistanê, mirin, ne dawiya jiyane ye. Destpêka jiyaneke azad û xweş e.

KEMAL ASLAN

**Hewcedariya bi saziyan**

**D**ema ku mirov li droka kurdan dinihêre, kurd tu caran ne razane, ne jî baz dane. Her tim serhildan û raparîn kirine. Ji bo serx-

webûn û azadiya xwe, her tim li ber xwe dane. Lê belê, di wan raparîn û serhildanan de hinek şaşî û heta mirov dikare bibêje tê de berjewendiyên şexsî, malbatî û heremî hebûn. Ji ber vê yekê jî, bi ser nekitin.

Lê belê, li gor bîr û baweriya min, mirov karê bibêje, ew pêl bihartin. Gelê esas a girîng, ya niha ye. Wekî ku tê zanîn, ev rojên ku em tê de ne, ji bo me gelekî girîng in, di pêşiya me de rojên dîrokî hene. Lê belê, ez bawer im ku em hebekî zor û zahmetiyê bibînin û jiyana me jî bive (bi xetere) bibe.

Lê em tu caran, ji bîr nekin, xwestina me jî gelekî girîng û mezin e. Heger em bixwazin ku encamek ji armanc û xwestina me derkeve, heger em bixwazin ku viyane me, ne bi destê dijminê me bê temsîlkirin, em bixwazin ku em bes êdî şepirze û bêpergal bibin, heger em bixwazin ku gelê cîhanê, me jî wekî mîletêkî binirxîne û perweyî me bike, (îro bi milyona gelê me li welatên biyanî penaber bûye) heger em

bi xwazin li watatê xwe vehawehin, heger em bi xwazin azad bibin, hewcedariya me bi saziyê neteweyî heye. Reso, Heso û Memo nikarin wê saz bikin. Bi destê wan çênabe. Bila rêxistinên kurdan hemû dengên min bibine xwe. Bila ew ji saziyên Tirkîyê îbretê bigirin. Ew çawa ji bo girava Qibrîsê gotina devê wan hemûyan dibe yek û li hemberî cîhanê diaxivin.

FEVZÎ Ê MECÎT

**Kedkarê cur bi cur**

**G**er kesê ku bixwaze li dijî zilm û pêkutiyê eniyê bistîne û li pey ilmê F.Engels û K.Marks bimeşe, pêwîst e hinek baran bigire ser milên xwe.

1- Divê ew mirov "internasyonalîzma Proleterya" yê baş nas bike. Ango bibe kedkarê inter-

nasyonalîst.

2- Divê "welatparêziya Proleterya" yê jî baş binase. Ango, bibe kedkarê welatparêz. Peywîra kesê kedkar yê welatparêz ev e. Divê her dem û her heyamê de li ku deverê gerdûnê dibe bila bibe, zilm û pêkutiyê ku burjûvazî li proleteriyê dike, bi livbazî nikaribe jî, bi ramana xwe, bi devkî an bi nivîskî protesto bike û rewşa xwe ya li dijî vê kirinê, bi awayekî vekirî li ber çavan raxe û li rex çîna karker ya ku ji hêla çîna serdest (burjûvazî) ve tê bînpêkirin cih bigire. Peywîra kesê "kedkarê" welatparêz jî ev e.

Li hemberî burjûvaziya ku di welatê wî de li ser kar e û ji derî berjewendiya çîna xwe hemû çînen kedkar ji armancên xwe yê nepaqij re kiriye meta û dixwaze vê rewşê her bidomînin, pêwîst e ku kedkarê welatparêz li dijî van serdestan gelekî çalak be. Bi teorî û bi pratîka xwe li rex çîna kedkar eniyê bistîne û şerekî mafdar bide meşandin.

KEDKAR ÇÎN

**Bi xaînan re wê hesap bê dîtin**

**G**elê Başûr serê pêncî salan e ku şerê faşîstên dewleta Iraqê dike, bi deh hezaran şehîd û mirî dan, qetlîam dîtin, koçber bûn, her awayên şerpeze û xizaniyê dîtine. Em bi ber dikevin û dilê me bêhtir xemgîn dibe ku, ew bi destên xwe hev dîkujin. Ji destê rayedar û serokên xwe kişandine û hê jî dikişîne.

Êdî bila gelê Başûr ji xwe re fêhm bike, serokê xwe yê neteweyî nas bikin. Xwe pê ve girê bidin û bidin ser rêça rast, rêça xelasiyê, rêça jiyana birûmet, rêça serxwebûn û azadiyê.

Bila ew zatên ku dibêjin em serok in jî, hişê xwe bidin serê xwe û bizanibin ku rewşa wan ev be, wê rojek bê ku wê gelê kurd bi serê wan ji xwe re bi gogê bilîze...

REMEZANÊ HÛRÎ

Der barê nifûsa kurdan de hejmareke tespîtbûyî nîn e, hejmarên ku tîn dan jî, hev nagirin. Ji 30-40 milyonî tê behskirin. Her wiha ev yek, ji bo nifûsa kurdên bakurê welêt jî wisan e. Ji bo vê jî, ji 15-20 milyonî tê behskirin.

Gelo hûn qet fikirîne ku, îro çend weşanê bi kurdî derdikevin, çi li Tirkiyeyê û çi jî li bakurê welêt. Vê heftiyê ez dixwazim bi kurtî li ser vê yekê bisekinim, hem jî bi ser re.

**Nûbihar:** Kovareke mehane ye. Di rûpelên xwe di cih dide berhem û çalakiyên çandî, hunerî û edebî û siyasî. Her wiha ji aliyê siyasî ve rengê wê îslamî ye.

**Rewşen:** Kovareke çandî hunerî, wêjeyî û zanistî ye. Ew

## Ji Welatê Me

ZANA FARQÎNÎ

### Em û weşanên me

ji aliyê Navenda Çandî ya Mezopotamyayê ve tê derxistin û ji du mehan carekê dertê. Em vê jî bibêjin ku, hemen hemen di her hejmara xwe de cih ji du-sê nivîsên bi tirkî re vediqetîne.

**Armanc:** Rojnameyê mehane ye. Di nav rûpelên wê de mirov li nivîs û berhemên siyasî, çandî, hunerî û edebî tê. Berê ev rojname li Swêdê

derdîçû, niha jî li Stenbolê.

**Govend:** Ji du mehan carekê li Amedê dertê. Kovareke çandî û hunerî ye. Ji bilî vê hemû kovar û rojnameyên xwerû bi kurdî li Stenbolê çap dibin û dertên pêşberî xwendevanên xwe.

**Zend:** Kovara Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ye. Tê de hatiye daxuyandin ku ji sê mehan carekê wê derkeve û

kovareke zanistî, edebî û hunerî ye. Heta niha hejmarek bi tenê derketiye. Tiştê ku em pê hisiyane hin gelşên wê yên hiqûqî hene ku dibine asteng li hemberî derçûna wê.

Tevî rojnameya me, 6 weşan deng li 15-20 milyonî dikin! Di nav wan de em bi tenê heftiyê ne.

Em jî, hema bibêjin em cih didine her tiştî. Ji ferhengokê heta bi nivîsên ji bo zarokan. Di vê serdemê de, dibe ku tu rojname ne wekî me bin. Belkî hinek li rojnameyê binihêrin û li gorî pîvanên welatên pêşketî wê binirxînin û bibêjin: "Ev çi tişt û çi teba ye. Tiştê kes nekirî dikin."

Êdî em nirxandina dawî ji we re dihêlin. Rewşa me eşkere li ber çavan e.

### Netewe-înkâr û netewe-pîskarî

Di jiyana mirov de, her tîkilî li ser bingeha berjewendiyên tîkilî danîn. Berjewendiyên mirov dibin sedema pêwendiyên. Pîranîyên tîkilîyên ku di navbera mirovan de çêdibin, li ser berjewendiyên cur bi cur çêdibin. Gava ku berjewendiyên mirov ji hev dûr dikevin, hingê tîkilîyên mirov jî, ji hev dûr dikevin. Ev tîkilî rîzîzanî (siyasî) be, ne rîzîzanî be nayê guhartin. Tiştê ku tîkilî guhartin, jiyana mirov bi xwe ye. Gava ku mirov ji civatekê sûtê wernegire, hingê mirov li dijî wê civatê dixebite.

Mahmut Baksî û Elîn Clason pirtûkeke bi swêdî, li ser kesên ku keçan ji Kurdistanê tînin û paşê wan berdidin, nivîsîne, ku navê pirtûkê "Bûka Video" ye. Ev pirtûk wekî senaryoyekê hatiye amadekirin. Di pirtûkê de behsa nebaşîya kurdan tîte kirin.

Gava dijminê kurd dest diavêjin namûsa keçên kurd, em bédeng dimînin. Lê em li kêmasiyên hev digerin. Xwezî em ew qas jî li kêmasiyên dijminî bigeriyana. Li aliyê Musa Anter, Cegerxwîn, Kemal Pir, Mazlum Doğan, Ferhat Kurtay, M. Hayri Durmuş, Mahsum Korkmaz, Akif Yılmaz... û li aliyê din Mahmut Baksî, Rêber, Id-rîsê Bîtîsî...

Heger rewşenbîrên kurd bi rastî demokrasîyê, serxwebûnê bixwazin, divê bikevin nava gelê xwe û bibin rêber û pêşeng; çewtî û nezaniyan rexne bikin û eniyekê şer li hemberî sextekarî û paşverûtîyê li dar bixin û bi xwe jî bibin şervan ji bo azadkirina welatê xwe.

Armancên mirovî an ku rewşenbîrî ji bo civatekê li ser çend xalên bingehîn ava dibin, ew jî ev in:

1- Demokrasiya pluralîzmê (dezgeh û rêxistinên cur bi cur)

2- Azadiya hiş û fikirê

3- Biratî û wekhevî

4- Berpirsiyarî (yanî rewşenbîrêkî nikare di dersxanê de mîz bike û bibêje "demokrasi" ye)

5- Alîkarî- piştgirî ji bo pêşketina civatê

6- Alîkarî ji bo gelên cîhanê yên bindest

7- Azadiya çapemeniyê

Azadiya rastiye ew e ku nivîskar di fikir û bîrên xwe de azad be, di bin hikariya tu dewletê de nemîne, hingê azad e. Mirovekî/ê rewşenbîr, ku bi serê xwe nefikire, bi serê xelkê bifikire, ew kes ne azad e. Yanî nivîskar di bikaranîna pênuşa xwe de ne azad be, pênuşa

tîte kirin.

Gava dijminê kurd dest diavêjin namûsa keçên kurd, em bédeng dimînin. Lê em li kêmasiyên hev digerin. Xwezî em ew qas jî li kêmasiyên dijminî bigeriyana. Li aliyê Musa Anter, Cegerxwîn, Kemal Pir, Mazlum Doğan, Ferhat Kurtay, M. Hayri Durmuş, Mahsum Korkmaz, Akif Yılmaz... û li aliyê din Mahmut Baksî, Rêber, Id-rîsê Bîtîsî...

Heger rewşenbîrên kurd bi rastî demokrasîyê, serxwebûnê bixwazin, divê bikevin nava gelê xwe û bibin rêber û pêşeng; çewtî û nezaniyan rexne bikin û eniyekê şer li hemberî sextekarî û paşverûtîyê li dar bixin û bi xwe jî bibin şervan ji bo azadkirina welatê xwe.

Armancên mirovî an ku rewşenbîrî ji bo civatekê li ser çend xalên bingehîn ava dibin, ew jî ev in:

1- Demokrasiya pluralîzmê (dezgeh û rêxistinên cur bi cur)

2- Azadiya hiş û fikirê

3- Biratî û wekhevî

4- Berpirsiyarî (yanî rewşenbîrêkî nikare di dersxanê de mîz bike û bibêje "demokrasi" ye)

5- Alîkarî- piştgirî ji bo pêşketina civatê

6- Alîkarî ji bo gelên cîhanê yên bindest

7- Azadiya çapemeniyê

Azadiya rastiye ew e ku nivîskar di fikir û bîrên xwe de azad be, di bin hikariya tu dewletê de nemîne, hingê azad e. Mirovekî/ê rewşenbîr, ku bi serê xwe nefikire, bi serê xelkê bifikire, ew kes ne azad e. Yanî nivîskar di bikaranîna pênuşa xwe de ne azad be, pênuşa

tîte kirin.

Gava dijminê kurd dest diavêjin namûsa keçên kurd, em bédeng dimînin. Lê em li kêmasiyên hev digerin. Xwezî em ew qas jî li kêmasiyên dijminî bigeriyana. Li aliyê Musa Anter, Cegerxwîn, Kemal Pir, Mazlum Doğan, Ferhat Kurtay, M. Hayri Durmuş, Mahsum Korkmaz, Akif Yılmaz... û li aliyê din Mahmut Baksî, Rêber, Id-rîsê Bîtîsî...

Heger rewşenbîrên kurd bi rastî demokrasîyê, serxwebûnê bixwazin, divê bikevin nava gelê xwe û bibin rêber û pêşeng; çewtî û nezaniyan rexne bikin û eniyekê şer li hemberî sextekarî û paşverûtîyê li dar bixin û bi xwe jî bibin şervan ji bo azadkirina welatê xwe.

Armancên mirovî an ku rewşenbîrî ji bo civatekê li ser çend xalên bingehîn ava dibin, ew jî ev in:

1- Demokrasiya pluralîzmê (dezgeh û rêxistinên cur bi cur)

2- Azadiya hiş û fikirê

3- Biratî û wekhevî

4- Berpirsiyarî (yanî rewşenbîrêkî nikare di dersxanê de mîz bike û bibêje "demokrasi" ye)

5- Alîkarî- piştgirî ji bo pêşketina civatê

6- Alîkarî ji bo gelên cîhanê yên bindest

7- Azadiya çapemeniyê

Azadiya rastiye ew e ku nivîskar di fikir û bîrên xwe de azad be, di bin hikariya tu dewletê de nemîne, hingê azad e. Mirovekî/ê rewşenbîr, ku bi serê xwe nefikire, bi serê xelkê bifikire, ew kes ne azad e. Yanî nivîskar di bikaranîna pênuşa xwe de ne azad be, pênuşa

xwe li gorî xwestina dilê xwe nikaribe bi kar bîne, hingê ew ne azad e û ne jî dikare bibe rewşenbîr.

**Hikariya kolonyalîst li ser kesîtiya kurd:**

Li Kurdistanê dewletên kolonyalîst, bi dezgehên xwe yên perwerdehî, leşkerî, dadî, îdarî û rêxistinên taybetî kar û barên li ser civaka Kurdistanê di-de domandin, ew jî ev in:

1- Rêxistin û partiyan dewletên dijmin

2- Dezgehên terora dewletan

3- Dezgehên dadî

4- Dezgehên piştaftinê

5- Dezgeh û rêxistinên kurdan (kurdên ku li dijî şoreşa neteweyî ne).

Dezgehên tirk, li ser kesîtiya mirovên kurd jî hikariyê ne baş kirine û kesîtiya kurd birîndar kirine. Dezgehên tirk kesîtiyê ne din di civaka me de çêkiriye. Di hemû waran

de dixwaze pêşîya pêşveçûna civaka kurd bigirin.

Ev tiştên hanê bûne sedemên nivkesîtiyê, derewkirin, netewe-înkâr û netewe-pîskariyê.

Dîsa jiyana ku kolonyalîstên tirk li Kurdistanê bi dar pêk aniye bûye sedema çêkirina jiyanêke tevlihev û komên cur bi cur wekî:

1- Rewşenbîrên kurd ên ku xwe tirk dihesibînin.

2- Rewşenbîrên kurd ên azadîxwaz. Lê di pratîkê de li dijî şoreşê ne.

3- Kesên, ji bo çareserkirina pirsên çandî, neteweyî û dîrokî serê xwe diêşînin û jiyana xwe wekî kurdekî didomînin. Di teorî û pratîkê de xwedî li çand û pirsên neteweyî derdikevin. Ji bo şoreşa neteweyî û serxwebûna Kurdistanê dixebitin.

MARUF YILMAZ

## FERHENGOK

**Araste:** Berpêyî (yönelme) -Min pîrsa xwe arasteyî wî kir

**Ast:** Sewiye

**Bandor:** Hîkarî, tesîr

**Berjewendî:** Menfeet

**Cînavk:** Zamîr, peyva ku cihê nav digire

**Dahat:** Hatina ji ber, fêkî û hwd. (gelir)

**Dotmam:** Keçmam, keça apê.

Di vir de peyv ji "mam" û "dot" ê pêk hatiye. Dot keç e, qîz e

**Gog:** Top, topa sporê

**Hawîrde:** Îthalat, import (import)

**Hêjandin:** Nirxandin, helsegandin (değerlendirmek)

**Hilberîn:** Îhtisal (üretim)

**Hinarde:** Îhracat, export (eksport)

**Hincirandin:** Tehdekirin, pelçiqandin (girtî ji aliyê leşkeran ve zefh hatine hincirandin)

**Kes:** Şexs

**Kesane:** Şexsî

**Kesîti:** Kesayeti, şexsiyet

**Paşgir:** Di gramerê de qertafên (ek) ku tîn paşîya peyvê û pê navdêr, rengdêr û kirdenav çêdibin

**Pêşgir:** Her wiha ev jî tîte pêşîya peyvê û eynî tişt pê tîne çêkirin

**Pisxaltî:** Kurxaltî, lawê xaltiyê.

Peyv ji "pis" û "xaltî" yê pêk hatiye û pis law e, kur e. Wekî pismîr, pismam, pisaxa

**Qemîtandin:** Qemirandin (cilên ku li ber êgir bûn tev qemîtin/qemirin)

**Qewartin:** Mirovên berê zinar diqewartin û tîte de distirîn (oymak)

**Sazî:** Muessese (kurum)

**Sûd:** Feyde

**Şaşwaz:** Kesê ku li hemberî bûyerekê mit û metel dimîne, nikare tişteke bike (şaşkın)

## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me Divê

	Li Hundir	Li Derve
<input type="checkbox"/> 6 Meh	<input type="checkbox"/> 1.000.000 TL	<input type="checkbox"/> 80 DM
<input type="checkbox"/> 12 Meh	<input type="checkbox"/> 1.800.000 TL	<input type="checkbox"/> 150 DM

Li derve buhayê rojnameyê 3 DM e.

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê** - Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Hesap No: 1100264-1

**Li Derve** - Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

**NAV û PAŞNAV** :  
**NAVÎŞAN** :

**Navnîşana Welatê Me**

Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.  
Tel-Fax: 293 53 19 - 293 53 20

## WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
ROZA Basın ve Yayıncılık  
San. Tic. Ltd. Şti. adına  
Xwedî (Sahibi)

Aynur BOZKURT

Heyeta Weşanê  
(Yayın Kurulu)

Zana FARQÎNÎ  
Aynur BOZKURT  
Sami TAN  
Suut KILIÇ

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran  
(Yazışleri Müdürü)

Metin AKSOY

**NAVÎŞAN (Adres)**  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL-FAX**  
293 53 19 - 293 53 20

**ÇAPXANE**  
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÜNERİ**  
(Temsilcilikler)  
**Çukurova-** Salihe Kevirbirî  
322-3597930  
**Suriye-** Jan Dost  
Fener Rojbiyanî  
**Berlin-** Silêman Sido  
Sîrwan Reşîd  
49-30-69002695

**Hannover-** Selim Biçûk  
49-5721-81360  
**Hamburg-** A.Hekim Gülsün  
49-40-403388

**Munchen-** Mahmut Gergerli  
49-871-670884

**Badenwurttemberg-**  
A. Rahîm Ayaz  
49-75453258

**Amsterdam-** Cotyar Zaxoy  
31-20-6130766

**Paris-** M.S. Ayçiçek  
33-1-48000401

**Atina-** Ferhan Zêbarî  
30-13634905

**Brukse-** Medenî Ferho  
32-16-490767

**Stockholm-**  
Robin Rewşen  
46-8-7510564

Kaxezfiroş Wehab û Musa ku di "sektora çopê" de cih girtine:

# 'Em her roj nexweş in li Edenê'

**Îro herêmek heye ku em dikarin bibêjin ew dever profîla Kurdistanê ye. Gelek kes jî dibêjin ku ew dever Kurdistana Biçûk e. Belê belê em behsa Herêma Çukurovayê dikin. Ku erdê wê ya dewlemend bi destê kurdên belengaz têne çandin û avahiyên 10-15 qatên Sabanciyên têne çikandin. Îro jiyana kurdên Çukurovayê li Edenê, Mêrsîn, Ceyhan, Osmaniye û Îskenderûnê bi şerê ku li Kurdistanê tê meşandin ve girêdayî ye.**

belê em behsa Herêma Çukurovayê dikin. Ku erdê wê ya dewlemend bi destê kurdên belengaz têne çandin û avahiyên 10-15 qatên Sabanciyên têne çikandin. Îro jiyana kurdên Çukurovayê li Edenê, Mêrsîn, Ceyhan, Osmaniye û Îskenderûnê bi şerê ku li Kurdistanê tê meşandin ve girêdayî ye. Li vê herêmê Kurdistanî di gelek sektoran de cih girtine.

Belê yek ji wan sektoran jî sektora "berhevkirin û firotina kaxez, naylon, cam" ango "sektora çopê" ye. Ev sektor li

Edeneyê û Mêrsînê di destê Sêrtiyan de ye. Ev diyolaga xwarê jî, bi 2 zarokên botî, ku kaxezan berhev dikin û bi vî awayî piçek be jî piştgirî didin malbatên xwe û jiyan a aboriya malbatên xwe xurt dikin.

Heval navê te bi xêr?

- Navê min Wehab e.

Hevalê Wehab, tu ji ku derê yî, tu çend salî yî û hûn çend sal e ku hatine Edenê?

- Ez jî gundê Êrkendê ya Perwariya Sêrtê me. 13 salî me û ev 3 sal e ku em hatine Edeneyê.

We ji bo çi dev ji

gundê xwe berda?

- Leşkeran bela xwe ji me venekir, ji me re digotin bibin "qorici". Her şev top diavêtin nava gund, em jî direviyan nava newal û şkeftan. Me got: "Em nabin ceş" û em hatin Edeneyê.

Di mala we de çend kes dijîn, ji weynî te, di mala we de xebatkar hene?

- Em di malekê de 17 kes dijîn. 3 birayên min zewicîne. Bavê min 55 salî ye û ew naxebite. Tenê ez û birayê xwe dixebitin. Ez kaxeza didim hev û difiroşim, kîloya wan bi 4 hezarî. Birayê min Mihemed jî li ser tebla xwe fêkî difiroşe.

Çima tu "çopçî" dikî? Gelo ma tu kar tunebû ku te bikira?

- Kar hene lê pereyên wan beredayî ye. Ez carekî li cem kebaçî dixebitim xwediyê dikanê di heftiyekê de 180 hezar pere dida min. Ez di karê sewaxê de jî xebitim, lê heqê rîya min jî dernediket.

Naxwe, tu di çopçîyê de karekî baş dikî?

- Li gorî wan karê din, dîsa ev kar baş e. Ez 150-200 hezar kar dikim, lê hinek hevalên min 400-500 hezar jî kar dikin. Ji ber ku ez heta nîvro dixebitim, pişt re jî diçim topê dileyîzim.

...Piştî vê bersiva Wehab, hevalê wî Evidrehman giliya wî ji me re dike û dibêje: Wehab, ji ber ku li pey keçikên delal digere zehf kar nake!...

...Em dêhna xwe didinê ku rû li Wehabê me



Zarokê kurd ku ew jî di sektora çopê de dixebite tê dîtin.

nemaye, ji şerman, zer bûye, dixwaze mijûl bibelê nikare... em jê dipirsin;

Ev çi dibêje hevalê Wehab, qey ev gotin rast in?

- Heval bi navê Xwedê ne rast e! Mûsa li pey keçikan digere, ji min re jî dibêje "tu jî were." Bi darê zorê min bi xwe re digerîne. Lê em bi cilê paqij digerin. Carina gava ku em bi hev re diçin çopê, em wan keçikan dibînin em şerm dikin. Em naxwazin ku ew me bi vî halê qirêjî bibînin. Mûsa evîndarî keçikeke tirk bûye, navê wê Mujgan e an jî Mujdat e. Bavê keçikê bi me hesiya da pey me heta Sanayî yolî. Lê êdî ez pê re nagerim. Ev tiştên ne baş in. Mûso jî beredayî ye. Mirovên wî li gund hemî "qorici" ne.

Kekê Wehab! Gava tu kaxezan dicivînî kesek bela xwe di te dide?

- Kesek nikare berê xwe bide me. Carekê 4 zarokên ereb uşaxî (ji erebên Edenê re tê gotin,

erebên elewî) hatin ku li me bixin. Ez û Mûsa em çûn ser wan, me ser û çavên wan di nava xwînê de hişt, yên man hevalên xwe berdan û reviyân. Lê sebavên polisan ji me naqerin. Tu îş û karê wan tune ye, hema têt û dibêjin: "Nerelisiniz? (Hûn ji ku ne?)" Dema em dibêjin "em Sêrtî ne" ji me re dibêjin "eşek oxlî eşekler siktir bibin herin" pişt re jî dest datînin ser erebokên me. 2-3 heb Niğdelî jî hene lê polis tu tişt ji wan re nabêjin.

Edene xweş e an welatê te?

- Wilehî heval ez kulmek axa gundê xwe bi vî Edeneyê nadim. Îro jî bihêlin ezê herim welatê xwe. Edene germ e, sebeb zehf in. Welatê me li ber vê derê cenet e. Em li vê derê her roj nexweş in. Yek ji me baş dibe, yên din dikeve. Pereyên me jî tune ye ku em herin cem doktoran. Li gund pere jî zehf bûn, kes nexweş jî nediket.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ



Zarokên ku kaxezan berhev dikin, piçek be jî bi vî awayî piştgirî didin malbatên xwe.

## YA TELEVÎZYONÊ...BERNAMEYA HEFTEYÎ YA TELEVÎZYONÊ...BERNAMEY

MED TV

**YEKŞEM**  
(1.10.1995)  
18.00-18.45  
Nûbihar  
18.45-19.30  
Serçavan  
19.30-20.00  
Dengûbas  
20.00-20.10  
Şîrove (A. Aktaş)  
20.10-20.40  
Keskesor  
20.40-20.55  
Reuters  
(Bûyerên Dinyayê)  
20.55-21.25  
Ciwânên kurd  
21.25-23.00  
Sînemaya  
Yekşemê  
23.00-23.20  
Dengûbas  
23.20-24.00  
Navên nemir

**DUŞEM**  
2.10.1995  
18.00-18.45  
Nûbihar  
18.45-19.30  
Ciwânên Baz  
19.30-20.00  
Dengûbas  
20.00-20.10  
Şîrove (Y. Kûçûk)  
20.10-20.40  
Jiyana gel  
20.40-21.10  
Hevpeyvîn  
21.10-22.20  
Kaniya Polîtîkayê  
22.20-22.30  
Di çapemeniya  
dinyayê de kurd  
22.30-22.50  
Bernama Helbestê  
22.50-23.00  
Danasîna  
Bernameya hefte  
23.00-23.20  
Dengûbas

**SEŞEM**  
(3.10.1995)  
18.00-18.45  
Nûbihar  
18.45-19.30  
Rêze film  
19.30-20.00  
Dengûbas  
20.00-20.10  
Şîrove (A. Aktaş)  
20.10-20.50  
Jin û jiyân  
20.50-21.20  
Dosya Aboriyê  
21.20-22.20  
Dosya KDP'ê  
22.20-23.00  
Kamera me  
li mala we  
23.00-23.20  
Dengûbas  
23.20-24.00  
Programa siyasî  
(sorani)

**ÇARŞEM**  
(4.10.1995)  
18.00-18.45  
Nûbihar  
18.45-19.30  
Gelawêj  
19.30-20.00  
Dengûbas  
20.00-20.10  
Şîrove (S. Çelik)  
20.10-20.40  
Dosyaya Cihane  
20.40-21.00  
Arkeolojî  
21.00-21.20  
Muzîk  
21.20-22.50  
Sînema film  
22.50-23.00  
Danasîna  
bernameya hefteyî  
23.00-23.20  
Dengûbas  
23.20-24.00  
Programa zazakî

**PENCŞEM**  
(5.10.1995)  
18.00-18.45  
Nûbihar  
18.45-19.30  
Hewarî Roşinbîrî  
(sorani)  
19.30-20.00  
Dengûbas  
20.00-20.10  
Xutba Dîn  
20.10-21.20  
Rojev  
21.20-22.00  
Kena Reş  
22.00-23.00  
Filmê Belgeyî  
23.00-23.20  
Dengûbas  
23.20-24.00  
Konser

**ÎN (6.10.1995)**  
18.00-18.45  
Nûbihar  
18.45-19.30  
Çarlî Çaplîn  
19.30-20.00  
Dengûbas  
20.00-20.10  
Xutba Dîn  
20.10-21.20  
Rojev  
21.20-22.00  
Kena Reş  
22.00-23.00  
Filmê Belgeyî  
23.00-23.20  
Dengûbas  
23.20-24.00  
Dîn û netew

**ŞEMÎ**  
7.10.1995)  
18.00-18.45  
Nûbihar  
18.45-19.30  
Rêze film  
19.30-20.00  
Dengûbas  
20.00-20.10  
Şîrove (sorani)  
20.10-23.00  
Şox û şeng  
23.00-23.20  
Dengûbas  
23.20-24.00  
Dîrok

